
kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

# bîrnebûn

hejmar 55 | 2013




# MIZGÎNÎ BO ZAROKAN!

**Kitêbeka nû bi herdu dialektên kurdî; kirmanckî û kurmancî di wê payîzê de derdikeve.**

### Kirmanckî

Semedo ke Findo her serê sibayî saete çar de cile ser o xo hol keno û ey hîşyar keno Dat Mendo ney ra eciz beno. O vano eke Findo xoholkerdişê serê sibayî nêterikno ganî cîya bibo.
Findo nê fikrê Dat Mendoyî rast veyneno. O wext o çend biwazo hende şîyêno xo hol biko. Labelê tena mendiş rasta zî weş o gelo? Eke merdim luyan zî bifikirîyo beno ke tikê xeter bo zî...

ISBN: 978-91-86139-64-3





### Kurmancî

Ji ber ku Findo li saet çarê sibehan hertim xwe hildavêje û wî ji xewê şiyar dike Mam Mendo êdî diweste. Ew dibêje, ku Findo dev ji hilavêtina xwe bernede, ew ê bikin ku textê wî yê razanê ji hundir derxînin.
Û li gor Findo ev hizireke baş e. Wê gavê heta ku bixwaze ew ê xwe hilbavêje. Lê ma bi rastî jî mayîna bi tena serê xwe tiştekî xweş e? Dibe ku ji ber hatina roviyan xeteriya xwe jî hebe...

ISBN: 978-91-86139-63-6








Bîranîna Dr. Nebî Kesen



Belgefîlma Mim kî yim?




Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî (RZDN)



Kongra KURD-DERê



Hevpeyvînek bi Zagros Çetinkaya re




Li Bakur dersên hilbijartî



Kurmancîya malê,
yan kurmancîya mamostayî/yê?

www.arsivakurdi.org

bîrnebûn

ISSN 1402–7488

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.
**Utges av Apec Förlag AB**
hejmar 55 | 2013

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi
Edîtor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

**Koma redaksiyonê**
A. Çiftçi, Dr. Mikaîlî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen, M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran, Mem Xelîkan, Mustafa Mıh, Özgür Kara û Yusuf Polat

**Adress**
Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046–(0)8–761 24 90

**E–post**
info@birnebun.com

**Internet:**
www.birnebun.com / www.birnebun.eu

**Têkilî/İlişki**
Danimarka: Irfan Baysal, 0045–27 11 58 83

**Belavkirin / Dağıtım**
Ewrupa:
Muzaffer Özgür
Bîrnebûn
Postfach 900348 , 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049–172 298 24 51


Türkiye
İstanbul
Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı:
Europa: 5 Euro
Türkiye: 5 YTL

**Abone**
Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası: (Bîrnebûn) bankgiro: 402-2224
Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için APEC, "Bîrnebûn"Bankgiro–Stockholm/Sweden
SWIFT: **HANDSESS**
IBAN: **SE07 6000 0000 0002 6588 5078**

Çap / Baskı: Apec–Tryck AB



**Süleyman Danışman** 1948an li gundê Çakan (Akarbaşı) ya qeza Karakoçan a Elezîzê hatiye dinê. 1971an de dibe mamoste û sê salan wek mamosteyê dibistana sereteyî, kar dike. Piştre li Stenbolê enstîtûta bilind a hunera wêna xilas dike. 26 salan wek mamosteyê wênan kar dike. Süleyman, li welêt di gelek dezgehên kurdan ên çandî û hunerî de aktîv dixebite. Ji ber van xebatên xwe cara yekem 1982an de li "*Diyarbekir-5 nolu*"yê de tê hepis kirin. Careka din ji ber xebatên xwe yên siyasî-çandî 1994an de tê girtin û demekê di girtihegê de dimîne û eynê sal tê berdan. Dûre di dawa KUM ê de 12,5 sal ceza jê ra derdikeve û bêçare dimîne, derdikeve derveyî welêt û li Swîsrê bi cih dibe.

Süleyman di gelek pêşengehên hunerî yên wêneyan de, hem li welêt û hem jî li Swîsrê beşdar bûye.

Birêz Süleyman hemû kataloga xwe ji bo kovara me pêşkeş kiriye. Wêneya li ser bergê, yek ji hunera wî ye.

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

www.arsivakurdi.org

# Naverok


6
Ji Bîrnebûnê
Alî Çiftçî

7
Parastina bi kurdî: Çîya za jê mişkek ket!
Nuhê Hecî Malê Herşîd

9
Hevdîtînên li Îmralîyê
Alî Çiftçî

13
Kongra KURD-DERê
Mem Xelîkan

16
Zilma Îlonê li Anatoliyê
Muzaffer Özgür

20
Li Bakur dersên hilbijartî
Amed Tîgrîs

24
Helbest
Seyfî Doğan

26
Mim kî yim?
Esîn Akgül Güneş

29
Hestên Mehkûm
Xizan Şîlan

31
Çend xwazka
Nuhê Hecî Malê Herşîd

33
Ma ez jî dikanim kurdî binivisînim?
Buco Demirsoy

36
Şopên dema xatirxwastinekê-III
Nuhê Hecî Malê Herşîd

43
Bîranîna Dr. Nebî Kesen
Alî Çiftçî

45
Kurmancîya malê, yan kurmancîya mamostayî/yê?
Remzî Kerîm

56
Parsekên Kurdistanî li Îskandînavyê
Rohat Alakom

62
Hevpeyvînek bi Zagros Çetinkaya re
Alî Çiftçî

66
Li teniştê jîyanê
Zagros Çetînkaya

68
Alamura
Zagros Çetînkaya

70
Zerdeştî
Seyfî Doğan

72
Ji Şoreş Reşî du kitêp

73
Weşanxaneya RÛPELê bi du berhemên girîng dest bi weşanê kir!

77
Amed: erdnîgarî, dîrok, çand, derket


www.arsivakurdi.org

# Ji bîrnebûnê

Ev hejmara di roja 21 sibatê, roja Zimanê Dayikê ya Navnetewî de derdikeve. Ev roj bi taybetî bo me kurdên Bakûrê welêt, ên Anatoliyê û li derweyî welêt, rojeka girîng e ku divê em hinek li ser dawestin.

21ê sibata sala 1999an de bi biryara UNESCO ku organeka Yekitiya Netevan (YN) e, bi navê IMLD *International Mother Language Day*, yanê Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî (RZDN) li ser pêşniyaza Bangladeşiyan hat diyarkirin. Di 21ê sibata 1952ê de, ji bo ku zimanê bengalî jî li gel zimanê Pakistanê yê fermî, urdu, bibe zimanê fermî, xwendekaran xwepêşandaneka girseyî li dar xistibûn. Polîs êrîş biribû ser xwepêşandaran û 11 kes hatibûn kuştin. Bengladeşiyan têkoşîna xwe ya ji bo fermîbûna zimanê xwe yê zikmakî domandin. Hukumeta Pakistanê neçar ma ku di 1956ê de urdu û bengalî bi hev re li Pakistanê bibin zimanên fermî. 21ê sibatê, di têkoşîna ji bo bikaranîna mafê zimanê zikmakî de qonaxeka girîng e. Ji ber vê yekê UNESCOyê ev roj pejirand. Bangladeş 1971an ji Pakistanê veketiya û bû welatekî serbixwe.

Ev roj her sal li seranserê cîhanê bi çalakiyên pirrengî tê pîrozkirin. Ji bo ku girîngiya perwerdeya bi zimanê dayikê, pirzimanî û pirçandî, bêt parastin û pêşxistin, konferans, civînên taybet û festîval tên organize kirin.

Armancên vê rojê ev in:

- Balkişandina ser mafê perwerdeya bi zimanê zikmakî (dayikê)
- Bilindkirina famdariya ji bo civakeka pirçandî
- Bilindkirina toleransa li hember mirovên cihêreng

Sekreterê giştî ya UNESCO, Îrina Bokova ji bo vê rojê dibêje;

***"Pirzimanî kaniya hêz û îmkana mirovahîyê ye. Ev aliyên me yên pirçandinî, fikirandin, nûkrina dîtinan, tolerans û guhartinan pêş dixe"***

Programa IMLDya 2013an wek tema; bi destxistina materialên ji bo perwerdeya bi zimanê dayikê hêsan be, hemû welatên endamên YN haydar dike ku bo pêşdabirina perwerdeya bi zimanê zikmakî li hemû dezgehên perwerdeyî; ji hêlîna zarokan bigrê heta zanîngehan û medya, bên peydakirin, divê bên dijîtalîzekirin û çapkirin.

Di derbarê vê rojê de li seranserê dinyayê bi hemû zimanên din meriv di malperên UNESCOyê de rastî adahdariyan dibe. Di malpera UNESCO ya Tirkiyê de, li ser vê rojê ti agahdarî tune ne. Pir balkêş e ku heta niha, ne ji aliyê UNESCOya navend ve û ne jî ji aliyê kurdan ve ev nehatiye rexnekirin û bal nehatiye kişandin.

Di vê hejmarê de li ser ziman û perwerde û herwiha nivisên ji pênûsên nû yên balkêş hatine weşandin.

Bi hêviya ev roja zimanê dayikê bi serkeftî be, bimînin di xêr û xweşiyê de!

*Ali Ciftci*



www.arsivakurdi.org

# Parastina bi kurdî:
## Çîya za jê mişkek ket!

*Nuhê Hecî Malê Herşîd (Nuh Ateş)*

Bi guhêrîneke di pêşnûmaya qanûna dadgehkirinê (mehkemekirinê) da, beyî ku navê kurdî tê da derbas bibe, goya rê li ber parastina (berevaniya) bi kurdî jî bê vekîrin.

Li gorê vê guhêrînê zimanê dadgehkirinê dîsa tirkî ye. Tenê ji xwendina îdîanameyê û miteleya esasî bi şûn da tawanbarkirî (sucdar) dikane bi devkî parastina xwe bi kurdî bîne ziman. Sewa vê gereke ku ew van şertan bicîh bîne: Qasî ku xwe pê ifade bike bi tirkî bizane û wergêrekî (tercumanekî) bi xwe ra bîne û bedelê wî ji kîsê xwe bide.

Ma tawanbarkirîyê xizan ê wergêrekî kurdîzan ji ku derê peyda bike? Tu dibêjî qey zaningeha wergêran ya zimanê kurdî li Tirkîyê heye.

Li ber tawanbarkirî yê tirkîzan du rê hene, ya ew ê ji parastina devkî ya bi kurdî fereget bike yan jî wergêrekî ji xwe ra peyda bike û bedelê wî helne ser xwe. Berdana bedelê wergêr bi ser tawanbarkirî da meriv dikane wekî cezakirineke ji ber bikaranîna îmkana parastina bi kurdî va bihesibînê û wekî bêqimetkirina zimanê kurdî bibîne.

Wer xuya dike, ji guhêrîneke bi vê şeklê yek armanc jî ew e ku, tu belgeyên bi kurdî nekevin dosyayên dadgehê. Tawanbar dê parastina bi kurdî û bi devkî pêşkêş bike û wergêr jî wê bi devkî wergerîna ser zimanê tirkî.

Wer tê fehmkirin ku kurdekî tawanbar û tirkînezan, ji ber şerta tirkîzanîyê, nikane ji vê îmkanê istifade bike. Lê di pratîkê da kurdekî tawanbar yê ku tenê çar gotinên tirkî dizane dê wekî tirkîzan bê qebulkirin û bikane ji vê imkanê istifade bike, bêyî ku ew îdîaname û mitaleya bi tirkî fehm bike.

Ma hetanî niha jî ne weng bû? Tawanbarên kurd yên ku di eslê xwe da tirkînezan, lê ji ber ku dikanîn bi tirkî bibêjin „erê“ û „na“, li ber dadgehan wekî tirkîzan tên û dihatin qebulkirin. Û ew bêyî ku îdîanema û mitaleyan fehm bikin tên û dihatin dadgehkirin. Yanê tawanbarkiriyên hana dê li

www.arsivakurdi.org

gorê guherîna di pêşnumayê da jî wekî tirkîzan bên qebûlkirin û bikanin ji vê imkane istifade bikin, eger şertên wê yên ku li jor qalkirî bînin cîh.

Ev guherîna li ser rê wekî gavavêtineke manîdar û erênî tê pêşkêşkirin. Dilê meriv qet nexwaza gûherîneke bi vî halî wekî gaveke „erênî lê bikêmanî“ jî binav bike! Nayê ser zimanî meriva ku wê rewayî gotina di pir zimanan da meşhor, „çîya za jê mişkek ket!“ jî bibîne. Guhêrineke bê serûbinî, piçûk, sînorkirî, sêhirbazekî û xapînok! Bizara jinan, xwelî bi serî we! Li wan derên me ku, kesekî kar û kirineke neçê kir, jin jê ra dibên, “xwelî bi serî we!”

Bi heqê zîmanê kurdî û bikaranîna wî tê lêyîztin. Carek din xuya bû ku, hikumet di qebulkirin û dayîna heqê zimanê kurdî da li gorê tektîka çinîbiçinî, yan jî kelûkol kirinê tevdigere.

Çare çi ye?

Çare rojekê pêş da qebûlkirina kurdî wekî zimanekî resmî û perwerdeya bi kurdî ye! Kêmtirî vê dersa kurdî ya ferz e, ne ya helbijartî!

Wekî din jî, pêwîst e ku bendên di qanûna bingehî da bên rakirin û qanûna parastin û bikaranîna zimanên ji xêyrî tirkî bê danîn. Ku kiriye min nebihîstiye, ma çima BDP pêşniyarekê derbara qanûnekî weha da pêşkêşî parlamena Tirkiyê nake?

Mainz, 21.11.2012



www.arsivakurdi.org

# Hevdîtînên li Îmralîyê

Ali Ciftci

Ev demeke dirêj e, li Tirkiyê, li ser “hevdîtinên” ku bi Îmraliyê re dibin, nûçe tên belav kirin û beyanên serokwezîr, Erdogan ên vê pêvajoyê, bi awayekî serkeftî belav dibin. Herwiha di wan demên dawî de jî em dibînin, êrîşên li hember kurdan jî roj bi roj zêde dibin. Balafirên şer ji Amedê radibin û baregehên gerîla, gund û warên Başûr bombe dikin. Navê vê pêvajoyê jî danîne, “pêvajoya hesas!”

Erê, hevdîtin an muzakere, bihevkirin, her navê wê çi dibe, bila bibe, ne tiştên çewt in. Divê hevdîtîn hebin, bê hevdîtinan doz çareser nabin! Lê, hevdîtin an jî muzakere ji terefên du aliyan ve, di zeminên  wiha de tên kirin ku herdu teref jî azad bin.

Ev hevdîtinên an muzakerên ku li Îmralîyê dibin, em tenê ji yek aliyê pêdihesin û tên agahdar kirin; ev jî medyaya Tirkiyê ye ku herkes baş pêdizane, alîgir e û bê dîtina resmîya Tirkiyê nikare tu tiştekî belav bike!

Gotin an dîtinên ku ez li vir niha bi we re parve dikim tenê li gorî wan agahdariyan in. Ji ber biryara hemû hevdîtinan ji yek aliyê ve dibin û tenê li gorî daxwaza dewletê dibe. Ev alî jî pir eşkere ye, dewleta Tirkiyê, di bin rêvebiriya partiya AKPê, bi serokatiya serokwezîr Recep Tayyip Erdogan e.

Niha em li vê senaryoyê temaşe bikin; hevdîtin bi kê re û çawa bi rê ve diçe?

Yek, memurekî MÎTa Tirkiyê bi navê Hakan Fîdan bi heyete xwe ve ji serokwezir emir digirê û wekî “elçiyeki” şertên dewletê dibe.

Yê dîn jî, li baregeheka eskeriya taybetî ya li Îmraliyê ku ev 14 sal in hatiye zîndan kirin, serokê PKKê, birêz Abdullah Öcalan e.

Yek zîndanî ye. Yanê êsîr û ne xwediyê tu mafan e û yê din jî azad û xwedî mafê her gotinekê, berpirsê MÎTa Tirkiyê ye! Tirkiyê temsîl dike.

Silametiya vê lihevhatinê di bin van şertên giran de, dê çawa



www.arsivakurdi.org

be! De werin, em hemû bi hev re li vê meselê binêrin!

Bi ya min berî her tiştî rewşa ku birêz Ocalan a zîndanê, rê nade ku muzakerên bi adalet û durustî pêk bên. Ji ber rewşa wî ya malum, ew ne azad e.

Ya diduya ji doz, ne dozeka şexsi an rêxistinekê ye! Doza zêdeyî 100 salî ye, doza neteweki bi navê Kurd û axeka bi navê Kurdistan e, li Turkiyê ye!

Çênabe, ev hevdîtinên wiha li ser vê dozê, bi veşartî, mît û polisan ve bên meşandin!..

Dawa neteweki ku li Rojhilata Navîn ji aliyê dewletên navnetewî ve jê ra sînor, bêriza wê netewê ve hatine danîn, tenê bi hewdînên wiha çareser nabe! Ev xapandine û bi derengî xistine!

Pirsa miletekî ku ev sed sal e, ji terefê dewletê ve ji hemû mafên xwe yên netewî û demokratîk bêpar, hatiye hiştên, hatiye pelçikandin, nesil bi nesil hatiye asîmîle kirin, hîn jî zarokên wî mîletî, di ev dema ragihandina pêşketî de, li welatê xwe bê statu ne.

Li Tirkiyê heta ku berpirs û rêvebirên dewletê, pirsa kurd û Kurdistanê rast bi nav nekin û hîn jî ji xelkê xwe re dibêjin; ev pirsgirek, pirsgireka terorê ye, ev tê vê mane, ku ev hîn jî dûrî muzekera ne û ji xelkê xwe re derewan dikin û tu lihevhatin û aştî jî çênabin!

Ez weke endamekî vî netewî pir, bi rastî pir ji dil dixwazim ku ev hevdîtin li ser rastiyê û ji bo lihevhatinan bin, daku aramîyek li ser erdê miletê ku ez jî endam in, bi cih bibe û ev aştî û aramî rojek ji rojan pêk bê! Ji vê jî bi rumettir, bi ya min tu tiştek din tuneye ku em îro ji bo xelkê xwe hêvî nekin. Ji ber ev qada şer, cîh û warê ku kurd li dijîn û rojane her buyereka ku li vir dibe, tesîreke mezin a neyênî li ser jiyana her kurdekî dike. Ji bo vê yekê jî kurd ne hewesdarê şer in. Pêwîstiya kurdan li vê navçê, ji her mîletî bêtir bi aştî û aramiyê heye.

Lê, em dibînin, kengê rewzeka wiha ji bo kurdan xuya dike ku kurd pê şad dibin, bi taybetî li Tirkiyê, ji terefê tirka ve; rast, çep, dîndar, muhalefet, yên li ser hukum, hemû bi hev re, li dij derdikevin û pir vekirî ji kêfxwaşiya kurdan re dilê xwe teng dikin û yekcar hemû deriyan digrên! Nimûnên wiha em herdem dibînin û bi salan e her emdamekî wî mîletî wê rastiyê dijî!..

www.arsivakurdi.org

Şiyara tirka ya veşartî ev e; ji kurdan re diltengî û xemgînîyê re, ERÊ, ji dilşadî û ken re, NA!

Ya herî dawî ku li gor hevdîtînên li Osloyê, dê grubeka ji gerîlayan bihatana ser sînor û bê silah xwe teslim bikirana, bo mesela lihevhatinê û aştiyê. Dema ev koma gerîla hat, xelkên ji deverê, bi kêfxwaşî ew xêrhatin kirin û dilşahiya xwe nîşan dan! Aliyê tirkan dîtin ku kurd bi rastî ji vê rewzê, bi girseyî, dilşa ne, yekcar bi medya xwe ya nîjadperest û militarist dest bi gef û giliya kirin ku çima kurd bi wê dilşa ne! Bi sedan nimûnên wiha li ser axa me rûdane.

Kurdan hêdî ev dewlet baş naskirine û ji her alî ve manevreyên dewletê dizanin!

Bifikirin, îro li kuderê welêt çi dibe, kî çi dike, di eynê saniyê de însan pêdihesin. Yanê însanê kurd hêdî ne ev kurdê salên, 1930-40, 60 û 70yî ye ku ji terefê dewletê ve bên xapandin.

Însanê kurd, hêdî xwedî zanyarî, agahdarî û bi quvet e. Politika dema nû jî ne weka berê ye! Teref çiqas aşkere û çi dixwazin, bêjin zû bi serdikevin. Hêdî dem ne ew dem e ku bi politikayên rojane û bi lîstikên sîyasî însan, bên xapandin.

Dewleta Tirkan, di van deh salên dawî de, ji gelek aliyên din ve, wek, civakî, teknîk û ticaretê uhd de guhartinên berbiçav kirine, çi hîkmet e, di mesela kurd û Kurdistanê de naxwaze xwe biguherîne. Polîtîkaya wan a fermî di vê meselê de, her înkarî ye!

Van du sê salên dawî ji bo ku kurdên derûdorên xwe û hinek daxwazên YE bi cîh bînin, çend gav avetin; wek radyo, televizyon, fêrbûna zimanê kurdî û bi zimanê xwe, xweparastin. Dema em lê dinêrin, ji bo ku fermî navê kurd û Kurdistanê bi kar neynin; dersên kurdî ku li universîteya têne dayîn, kirine "*yaşayan diler/zimanên zindî*", navê televizyona ku bi kurdî weşanê dike, kirine*; TRT6* û vê dawiyê ji bo ku di mehkeman de siyasiyên kurd bi kurdî deng bikin; navê vê jî kirine, *bi zimanê diya xwe, xweparastin* û hin ev jî têrê nake, divê ev kes an kesa ku dê bi kurdî deng bike, mesrefê tercumanîyê jî ew bixwe bide. Yanê kurdî dengkirin jê ra ceza dê bêt birîn.

Bi kurtî heta niha tiştêk ku ji terefê hukumetê ve di mesela kur-



www.arsivakurdi.org

dan de tê xuya kirin û gotin ev e; ku li Tirkiyê tu pirsgirêka kurdan tune, tenê pirsgirek a şexsan e, wek pirseka miletekî nabînin.

Di vê prosesê de her kurdek, li ku dibe bila bibe, bi kijan baweriyê û partiyê re be bila bibe, divê xwedî daxwaze mafê xwe yê çarenûsî bike. Ev jî bi ya min her kurdek divê aligirê daxwaza mîletî xwe be, bo nasandin û bi destxistina mafê xwe yê netewî têbikoşe.

Kurd divê wek netew, bi her aliyê xwe yê netewî ve bêt nasandin, wek; reng, deng, nav û ziman re statuyek bêt dayin û ev bi rêya qanûna bingehîn bêt parastin.

Mafên zarokên kurdan fermî bin, ji bo ku perwerda xwe ya seretayî bi zimanê xwe bibîne daku xwedî nasnameyeka xwe ya netewî be, kesayetiya xwe ya netewî bigrê ku pê serfîraz û serbilind be.



www.arsivakurdi.org

# KONGRA KURD-DERê

**_Mem Xelîkan_**



KURD-DER, di sala 2004 an li Ankarayê hatibû damezrandin. Li ser çand û zimanê kurdî dişuxule û lêkolînan pêk tîne. Piraniya xebata wan li ser kursên zimanê kurdî ne. Di roja 20.10.2012an de kongre ya xwe ya 5an pêk anî.

Kongre, di ciyê komalê yê nû (Cihan Sk. No: 11/7 Sıhıye/ Ankara), saet di 13.30 an de destpêkir. Bi qasî 60-70 kes beşdarî kongrê bûn. Serokê BDP yê bajarê Ankarayê, Ahmed Aday, wekî serokê rêvaberê (dîvana) kongrê hate hilbijartin. Birêz Ahmed Aday, di axaftina xwe da girîngîya ziman, parastin û pêşvebirina vî anî ziman. Çalakiyên kurdên di girtigahan de, ji bo bi zimanê dayîkê perwerdebûyîn û bi zimanê dayîkê li dadgehan xwe parastinê, di gireva birçîbûyînê de ne, behs kir û li çalakiya wan silav kir.

Dûva serokê *Kurd-Derê* Ankarayê Mustafa Karaman, dest bi axaftina xwe kir. Birêz Karaman, di axaftina xwe de got: "*Gelî hevalan, çawa hûn dizanin ziman, ragihandina sereke ya di nav mirovan de ye. Ji ber ez mirovhez im, ji hemû zimanan hez dikim. Lê teqez zimanê dayîka min li bal min pir şirîn e û bêguman ez jê zêdetir hez dikim. Di rastî ya xwe de jî kurdî zimanekî birêkûpêk, lihevhatî ye. Çewisandinên li ser kurdî hatine meşandin li ser kîjan zimanî bihata kirin niha behsa wî zimanî tenê di nav rûpelên dîrokê de dê bihata kirin. Ez, di vê baweriyê de me ku kurdî bi hemû zarava û devokên xwe ve di nav baxçeyê çand û zimanên cihanê yên sereke de cih girtiye. Tu hêz, nikare êdî bi asîmilekirinê ji holê rake.*

www.arsivakurdi.org



*Dostên hêja, çawa tê zanîn hemû cure raman, zanîn, bi alikariya ziman tê îfade kirin. Ji ber wê yekê em dikarin bibêjin ku rûmeta ku ji ziman re were dayîn, di heman demê de ji mirovahîyê re jî tê dayîn. Ziman hêmana bingehîn ya ku netew dike netew e. Di navbera ziman û netewe de giradaneke pir xurt heye. Heke zimanê neteweki tunebe, behsa netewbûna wî nayê kirin.*

*Ew 90 sal in dewleta Tirk polîtikaya asimîlasyon, imha û tinbunê li ser Kurdan dimeşîne. Di vê polîtikayê de giringî da ser tunekirina kurdî. Dewletê bi vê hewldanê xwast ku Kurdan berê ji ziman, paşê jî kesayetî û nasnama wan bi dûr bixe û wan ji erdnigariya wan biqewtîne. Mixabin, dixuye ku heta radeyekê gihştiye armanca xwe."*

Dûre birêz Karaman, derbarê kar û barê Kurd-Derê de agahdarî da beşdaran. Ji bo ku, li hember asimîlasyonê bibin asteng, giringiyeke mezin didine xebatên ziman. Li Ankarayê, hersal qasî 250-300 kes beşdarî kursên ziman dibine.

Sala çûyî, qasî 400 kesî ji bo kursên ziman serlêdane. Ji wana 250 kesan kurs qedandine. Wan kesan, bi devokên kurmancî, dimilkî û şêxbizinkî jî şuxula atolyê pêk anîne. Îsal, 300 serlêdan bûne. ji wan 220 qayit kirine û ew beşdarên kursan in. Ji bo serdema duyemîn 80 kes qayit kirine û nêzîkî 200-250 kesî kursê bidin re amadene.

Sala 2012an de:
Kurmancî: 8 pol (Sınıf)
Dimilkî: 2 pol
Soranî: 1 pol
Şêxbizinkî: 1 pol û xebata atolyê



www.arsivakurdi.org



Birêz M. Sadık Varlı jî repora aborî xwand û behsa kar û bar û xebata komalê kir û got: "*Bernameyek bi piştgirîyaYekitîya Ewropayê hat amade kirin. Li gorî bernameyê du sempozyum û gîhandina 20 mamosteyan hatîye payîn. Ew bername wek proje hatiye pejirandin dê piştî cejna qurbanê bê mor kirin.*"

KURD–DERê çend meha berê ciyê xwe guherî. Niha, li Sıhhıye navnîşana: Cihan sk. No: 11/ 7 karê xwe didomîne. Li wir du daîre girtine. Yek ji bo kursan wek fêrgeh, yek jî ji bo revaberî ye veqetandine.

Kurdên Anatolîya Navîn, bi ser pêşnîyazîya çend hevalan du car in ku li wir dicivin. Ji bo ku bi serketin, bi navê Kurdên Anatolîya Navîn komal an jî sazîyek din (wek Waqif) damizirînin. Her civînekê bi qasî 15-20 kesan beşdar bûn. Herdu civîn jî bê rojev berhev bûn. Ji bo ku beşdar hevûdu nasbikin û ji bo tiştekî weng fikirên xwe bînin ziman. Baş jî bû. Wan hevalan bîryar girtin ku civîna sisê bi rojev bi kar bînin. Hevalên dixwazin têkilîyê çêbikin, dikarin serlêdanê li Kurd-Derê bikin.



www.arsivakurd.org

# ZİLMA ÎLONÊ Lİ ANATOLİYA NAVÎN JÎ HEBÛ

*Muzaffer Özgür*

Sala 1980 û meha îlonê bû. Li welat leşkêran dest dabûn ser revabiriya dewletê û rewşa awertê hebû. Dibistana min jî hîn dest pê nekiribû û ez li gund bûm. Herroj leşker dihatin gund û gundî di bin tirsa leşkeran de bûn. Rojekê hemû gundî li ber mizgeftê berhevkiribûn, ji wan pirsa sîlehên kaçaxî dikirin. Çend gundîyan sîlehên xwe yên bi vesîqa devletê anîbûn û teslimî serleşker dikirin. Le wan ji gundiyan hîn zede sîleh daxwaz dikirin û serleşker digot;

-„Ez bawernakim, ku li gundê we sîlehên kaçaxî tûnebin. Ez ê çend roja îzne bidim we, hûnê bi xwe sîlehên xwe ji min re bînin qerekolê.“

Gundiyekî rûspî got;

„Komutanê min ma sîlehên me hebin em ê bidin we. Tunen, em eşkerê dibên tunen.“

Serleşker bi wê gotine pir bi hers ket û ji şûna rûniştî rabû hat cem gundiyê rûspî û bi pîna xwe di zikê gundî de veda. Gundî gêr bû û li ser erdê bi eşa xwe re kire nale nal. Hemû gundiyan li hev mezekirin û leşkeran jî silehên xwe berva gundiyan kirin. Çend kesan, gundiyê li erdê nale nal bû rakirin birin ber derîyê mizgeftê. Serleşker got;

-„Ez niha terim, heta çend rojan mixtar û gundiyên sîlehên xwe heyî ma werin qerekolê.“

Serleşker li ereba eskeriyê sîyarbû, leşker jî ji dûva, ajotin çûn. Gundî hemû beziyan ba merivê ji aliyê serleşker va hatî pîn kirin. Rewşa wî baş bû, le morala gundiyan gelek xirab bû.

Ez jî vegeriyam çûm mal. Ez bi we bûyera hatî ser gundiyê me pir eşiyabûm. Çend seetan bi şûnda Apê Miç hat mala me û bi bavê min va li ber siya mala me li ser bûyere deng dikirin. Demeke bi şûn da jî çend cîran tewê wan bûn. Yekî got;



www.arsivakurdi.org

„Gundê me 100 km nêzikî paytaxta welatê, ew rewş li wan deran xerab bû bi şûnda, li rojhelata welat, gundên kurdên me yen li çiya ka leşker çi pirs û zordariyê dikin Xwêdê dizane." Apê Miç got:

„Zordariya leşkeran herdem heyê. Dema cûnta çebû ev eşkerebû ku evê zilm û zordariyê bikin. Ma kes xwe paşda negire, ke sîleha xwe heyê ma teslîmî wan bikin. Nebû ew ê herroj werin gund û li me zordariyê bikin. Ji dema Mustafa Kemal de heta îro weng e. Ew welat welatê leşkera ye." Piraniya cemaatê bi serê xwe gotinên apê Miç erê dikirin…

Çend roja bi şûnda ez ji mal derketim berva nav gund çûm. Li ber dukana Heso çend hevala sohbet dikirin. Mijar, leşker û kirina wan bû. Dema min silav da hevalan, şorê di devê Cemo de bû. Cemo li Konyayê dibistan xelaskiribû û ew di nav çalakiyên siyasî de pir aktîv bû û çend hevalên wî jî hatibûn girtin. Wî xwe li gund dipareza û dema kesî bigûman nebû, xort agahdar dikirin. Li ser zimanê wî cûnta îlonê hebû. Hevalan pirs jê dikirin û wî jî li gor zanebûna xwe bersiva wan dida.

Cemo, hevalê Yılmaz Demir bû. Wan di nav Rîya Azadî de xebat dikirin û çalakvanekî mezin bûn. Li gor xwe cûnte rexne dikir û digot:

„Lazim e ku em xwe piparêzin. Tiştekî din ku çêbû ez ê ji hevalan xeberê bigirim û ez we agahdar dikim. Pir heval û hogir hatine girtin. Yilmaz jî li Amedê hatiyê binçavkirin û tu xeber jî tine." Min pirsî:

-„Kekê Cemo, Yilmaz Demir hatiyê girtin?"

-„Erê"

-„Li ku?"

-„Li Amadê."

Morala min gelek xerab bû. Min Yılmaz li Konyayê naskiribû. Çalekvanekî bê tirs û kehremanê dilê min bû. Ez li ber dûvarê dukana Heso li ser çokên xwe rûniştim û hevûdu naskirina min û Yılmaz hatibû ber çavên min. Ez ketim xewn û xeyalan.

Berî 12ê Îlonê di nav Kurdên Anatoliya Navîn de hereketa Riya Azadî jî wek DDKD xurt bû. Gelek xortên gundên me di nav wan rexistinan de cîh girtibûn. Çalekî jî pir dibûn. Rojekê dîsa li Zanîngehê û dibistanên lîse de faşîsta erişî xortên çep û kurdan kiribûn, li her aliyê bajêr dengê alarma erebên polîsa dihat. Ez ji di-

www.arsivakurdi.org

bistana xwe derketibûm û li bendê otobûsê ku herim malê.Bistekê bi şûn da Erebeyêka polîsan di ber min re derbasbû û di paşiya ereba polîsan de Cemo û kesekî din hebû. Tirs ket dile min. Ez bi otobûsê heta garaja otobûsên ku di nav welat de terin-ten çûm. Xalê min otobûsa xwe hebû û fîrma wan de jî berpirsiyar bû. Dema ez ketim odeya xalê xwe ji min pirsî;

„Çibû, çima tu hatî?“ min girtina Cemo je ra eşkerê kir. Ew pirr pê eşiya û şorên xerab ji devê wî derketin, digot;

„Min çend car Cemo agahdar kir, ma çalekiyê xwandevanan li wî ma ne.“Derbasî ser telefonê bû û ji merkeza polîsan re, ji nasên xwe re telefon dikir û dixwast rewşê wî bizane. Di nav wan teşqêlan de kesek bi lez û heyecan ket hundirê odeya xalê min û got;

"Ehmed, kurban lavê min hatiye girtin, çi dikî bike, xelaske. Polîs ê zilmê pê bikin.“

Xalê min got;

„Rûnê helê, telaşa min jî ev e, ez mes dikim. Muzaffer ji apê xwe re çayê bejê!“

Kesê hatî jî ji wan deran bû, kurmanciya me deng dikir û nasê xalê min bû an jî wî jî li wan deran kardikir. Min meraq dikir lê ez ditirsiyam ku pirs bikim. Kesê hatî, telika xwe ji serê xwe derxistibû û kiribû nav jûniyê xwe. Bi heyecan bû, tirs û meraq ketibû canê wî. Çay bi heyecanêke hat wexwarin. Dema telefona li ser masê le ket; zir…, zir…, zir… xalê min got;

„Kontaş, kerem bikin.“

Bi bersiva xalê min re me fahmkir ku tel ji merkeza polîsan tê. Xalê min rewşa Cemo û lawê hevalê xwe pirsî û agahdarî danstandin. Navê hevalê bi Cemo re hatî girtin Yılmaz Demir bû û ji gundê Încowê bû.

Qehremanê min di çalekiyeyêka xwandevanan de erişa faşîstan şikenabûn û çend kes jî birindar kiribûn, le mixabin hatibûn girtin. Xalê min soz girtibû ku wan herduyan evarê ji merkeza polîsan bigire; işmar bike, agahdariya bide wan û ji bo carek din beşdarî çalekiyan nebin sozê ji wan bigire.

Çend saetan bi şûnda ez û xalê min bi erebê çûn ber merkeza polîsan. Ez di erebê de mam û xalê min çû hûndir, demeke bi şûnda bi du xortan va hat. Wan gelek kut xaribûn û porê wan jî dabûn makînê, kurîs kiribûn. Li paşîya erebê siyarbûn. Ez wegeri-

yam min li wan mêze kir. Çavên wan dibiriqîn. Hêrs û kîn dihat xûya kirin. Dema min li çavên Yilmaz mêze kir, mînak buriskê şekitî, dilê min eşiya. Sempatiyeka gelek mezin ketê dilê min, ew binçav kirina wan, ez berva hereketa Kurd û Kurdistanê birim û hatim wan rojan.

Ji wê rojê bi şûn da ez li cem wan bûm. Cemo gundiyê min bû û Yilmaz jî hevalê wî bû. Min gelek heval û dost nas kirin. Wan pirtûk didan min. Min jî bi dizî dixwandin. Ez bûm sempatîzanê wan. Demeke bi şûnda Yılmaz nekanî li Konyayê herê dibistanê û çû Amedê. Min gelek kurdên aliyê me naskirin, hîn jî hevaltîya me berdewam e.....

Ji kurahî dengek dihat min "Mizo, loo Mizo ma tu bi rûniştî raketî..." Ez bi xwe de hatim. Min xeyala xwe ji hevala re eşkere kir em hemû tevûhev pê êşiyan.

Demek derbasbû bi şûnda xebera reş hat ku Yilmaz di zîndana Amedê de ye. Çend sal şûnda jî di koxûşa 5an da di berxwedanê de şehît ket. Gotina wî ya ji bo kar û xebata Kurdistanê *"Kesê ku ji bo azadîyê şer neke jê re azadîxwaz nayê gotin! (özgürlük için savaşmayana özgürlükçü denmez!)"* ji bo me bû ders.

Di dîroka gelê me de heta îro bi hezaran şehîdên me, wek rojê reya me ronî dikin. Em wan bîrnakin û wan bibîrtînin.

Îlonê li ser me jî gelek xirabî anîn. Li aliyê me gelek civan ji dibistanan bi dûr xistin. Bi hezaran civan ketin rêya Ewrupayê û li welatên Ewrupa bûn penaber. Bi wê re jî koçberiyeka nû, bi şikleka din dest pekir. Paşê jî hemûyan li Ewrupa cîh girtin. Gundên me vala bûn. Dewletê jî bi hatina wan a welatên Ewrupa ji aliyê aborîda karekî mezin kir û ji aliyê siyasî jî demeka rihet derbas kir. Gundên me ketin berdestên nezanan û wan jî bi hemî xwe teslimî devlete kirin. Koçberiya di dema 12ê Îlonê de destpekirî nêzikî deh salan ajot û tesîra xwe ya nebaş hîn jî berdewam e.

Lê berxwedan jiyan e!

Köln, Rêbendan 2013

birnebun@hotmail.de

www.arsivakurdi.org

# Li Bakur dersên hilbijartî

*Amed Tîgrîs*

Di 15.12 2012an de li Stockholmê ji aliyê Navenda Pedegojiya Kurdî û ABFê ve li ser mijara ”li Bakur û Rojavayê Kurdistanê rewşa perwerdeya kurdî semînrekê hat li darxistin. Modaretoriya semînerê mamoste Heqî û Nîzamedin Akkuş kirin. Amed Tîgrîs li Bakur rewşa hîndekarî û perwerdeya kurdî, Fatma Savci li Rojava rewşa hîndekarî û perwerdeya kurdî, Zîwer Haco û Zagros Haco li Rojava dîroka ziman û çandê û Azad Heyderî jî li ser jiyan û berhemên rewşenbîr ên Rojavayê Kurdistanê rawestan. Em axaftina ku Amed Tîgrîs a di vê konferansê de pêşkêş kir, li jêr diweşînin:

Dema we xweş gelî hevalên hêja û hûn hemû bi xêr û xweşî hatin!

Ez ê li ser rewşa hîndekarî û perwerdeya li Bakurê Kurdistanê bi awayekî kurt rawestim. Wekî ku hûn jî dizanin ev çend sal in ku kurd li Bakur di dem û dezgehên xwe de dest bi perwerdeya kurdî kirine û hîn jî ev xebata perwerdeyê dom dike. Ji aliyê din ve her ku têkoşîna kurdan jî xurt dibe, dewlet jî ji aliyê xwe ve bi gavên biçûk dest bi hîndekarî û perwerdeya kurdî dike. Ji ber vê, yekê ez ê di vê axaftina xwe de li ser beşên kurdan û dewletê cuda cuda rawestim.

Ez dikarim hîndekarî û perwerdeya ku kurd dimeşînin, bikim sê beş û bi kurtî weha vebêjim.

A) li Kurdî – Derê

B) li Şaredariyan

C) li komele, dem û dezgehên din.

Navenda Kurdî-Derê li Amedê ye. Li seranserê Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê 26 şaxên (şûbeyên) wê hene. Kurdî-Der her rojên şemî û yekşeman ji bo temenmezinan kursên kurdî didin. Ji bo zarokan kurs li Kurdî- Derê tune ne. Ji ber ku ji aliyê dewletê ve qedexe ye. Li navend û şaxan Kurdî-Derê gelek polên (sinifên) kursan hene. Û heta niha Kurdî-Derê bi hezaran kes perwerde kirine. Perwerdeya Kurdî-



www.arsivakurdi.org

Derê ji du astan pêk tê. Asta yekem û ya duyem. Di dawiya her astî de îmtîhan heye û kesên ku serbikevin belge digirin. Di van kursên Kurdî-Derê de pirtûkên bi navên Hînker weke pirtûkên ên dersê tên bi kar anîn. Di warê materyalên dersê de gelek kêmasî hene.

Li hemû şaredariyên ku di destê kurdan de ne gelek cureyên kursan hene û di nav wan kursan de kursên sereke yên ziman, wêje, muzîk û stran, çand û yên folklora kurdî ne. Dîsa her rojên şemî û yekmiyê li şaredariyan bi sedan kes beşdarî van kursan dibin.

Ji derî Kurdî-Der û şaredariyan di gelek komele û dem û dezgehên din de jî kursên kurdî, wêja û çanda kurdî hene.

Ev hemû dem û dezgehên kurdan di van çend salên dawî de, di warê hînkirin û perwerdeya kurdî de roleke gelek girîng û mezin lîstine û dilîzin. Weke encam niha bi hezaran kes dikarin kurdî bixwînin û binivîsin. Li ser berhem û mijarên kurdî niha li zanîngehan gelek kes tez amade dikin. Di eniya kurdan de rewşa hîndekarî û perwerdeya kurdî weha ye, lêbelê di eniya dewletê de çawa ye? Aliyê dewletê jî em dikarin di du beşan de bigirin dest. Yek jê li zanîngehan e.

**Li zanîngehan**

Sê sal berê cara yekem dewletê li zanîngeha bajarê Mêrdînê ku jê re zanîngeha *Artuklu*yê dibijin dest bi perwerdeya zimanê *jîndar* an jî herêmî kir. Ji ber ku navê kurdî derbas nebe, vî navî lê kirin. Li zanîngeha Artukluyê beşê perwerdeya mamosteyên kurdî heye. Di sala 2010an de 20 kesên ku bi kurdî dizanin, zanîngeh qedandine û xwedî tez in, girtin. Di sala 2011 û 2012an de heman hejmarê yanî ji bo her salî 20 kes girtin. Di nav van 20 kesên îsalîn de 17 kurmancîaxêv û 3 jî zazakîaxêv in. Îsal 250 kes jî yên ku zanîngeh qedandine, lê ne xwedî tez in jî girtine.

Ji derî zanîngeha Artukluya li Mêrdînê dewletê li Dêrsim û Çewlikê (Bingolê) jî beşê zazakî vekiriye. Îsal biryar hatiye girtin ku li zanîngeha Alpaslan a li bajarê Mûşe û li zanîngeha Dîclê ya li Amedê jî beşê kurdî vekin. Li zanîngeha Dîclê ya Amedê niha ji bo xwendekarên ku tibê dixwînin kursa kurdî dest pê kiriye. Tê gotin ku gelê kurd bi tirkî nizane û nikare derd, êş û nexweşiyên xwe ji doktoran vebêjin.

Belê, îsal jî dewletê sîstema dersên hilbijartî anî. Ka em bi hev re li dibistanên seretayî binêrin.



www.arsivakurdi.org



### *Li dibistanên seretayî*

AKP sîstema xwe ya perwerdeyê ji binî ve guhert û sîstema 4+4+4 anî. Yanî dibistanên seretayî kirin sê beş û her beşek 4 sal in. Piştî sala çaran şagird serbest in û dikarin bi dil û daxwaza xwe dibistan biguhêrin. Bi vê sîstema nû ya 12 salan re dersên hilbijartî jî hatin qebûl kirin. Şagird dema bixwazin, dikarin ji van dersan yekî weke dersa hilbijartî hilbibjêrin:

Jiyana Hz. Muhammed
Quran,
Exleq û ol
û zimanê dayikê.

Îsal bi tenê şagirdên ku diçin pola 5an dikarin dersa zimanê dayikê hilbibjêrin. Ev jî bi mercê ku bi kêmasî 10 şagird zimanê dayikê bixwazin, wê demê rektor (mudur) dikare daxwaza wan qebûl bike. Ji bo polên din kursa zimanê dayikê tune. Saleke din dê pola 6 û 7an jî lê bên zêde kirin.

BDP, Egitim-Sen (sendîqeya mamosteyan), Kurdî-Der û dem û dezgehên nêzîkên wan dibêjin ev xapandin e û em van dersên hilbjartî boykot dikin. Em naxwazin zarokên xwe bişênin van dersên hilbijartî. Ji ber vê helwesta kurdan hejmara şagirdên ku niha beşdarî dersên hilbijartî yên kurdî dibin gelek kêm in. Li gorî statîstîkên wezareta perwerdeyê li seran serê Kurdistan û Tirkiyê 22.500 şagird beşdarî kurdî dibin.

Min bi xwe bi hinek birêvebirin BDP, Kurdî-Der û Egitim-Senê



www.arsivakurdi.org




re gotûbêj kir û min got: “Ez dibêjim mirov boykot nekira û zarok beşdar bûbûna baştir bû. Dê bi milyonan şagird beşdarî dersên kurdî bûbûna û qet nebûya alfabe û giramera kurdî hîn bûbûna. Û mirov rexneyên xwe jî bikirana û bigotana ev dersên hilbijartî xapandin e û ne li gorî mafê me ye. Divê perwerde li Kurdiatanê û herêmên ku kurd lê dijîn ji pêşdibistanê heta zanîngehê bi kurdî bin û birêvebiriya wê jî di destê kurdan de be...” Lê ev dem û dezgehên me kurdan ên siyasî û çandî jî dibêjin: ” Na, divê em di yek carekê de hînkarî û perwerdeyê ji dibistana seretayî heta zanîngehê bigirin destê xwe yan em boykot dikin..."

Dewletê mehek berî niha ji bo pola 5an a kurdî pirtûkeke amade kir, ji çapê derket û li dibistanên ku dersên kurdî li wan tên dayîn belav kir. Nivîskarên pirtûkê mamosteyên zanîngeha Artukluyê ne. Navê wê *Kurdî 5* e. Nivê wê bi kurmancî û nîvê din jî bi zazakî ye. Zazakî wergera kurmancî ye. Di rûpelên pêşî de alaya tirkan, merşa wana netewî “Istiklal marşi” û wêne ya Mustafa Kemal Ataturk hene. Ji derî van hersê rûpelên pêşî naveroka pirtûkê gelek normal e û pedagojîk e. Kurdiya wê jî gelek baş e. Lê asta wê gelek nizm e, ne di asta pola 5an de ye, di asta pola 2 û 3an de ye.

www.arsivakurd.org

# Helbest

Seyfi Doğan

mêxlîm hes rakirê ber textî reş
û jê pirsî
cîranên Tirkiyê bêjmêra
hesê gelek dereng dest bi dibistanê kiri bû
lowma jî salên vî ji hevalên xwe yê telebê mezintir bû
hes şivanê ki baş
sergovend
şivê xwe yê giran
bieqil û kexîl bû
hesê dema kê li dor alîyê xwe mezekir bi şunda
cîranên Tirkiyê;
sefka köy, girî kocê, yaylê malê mihtopalê, yaylê malê oskî osmên
tatar köy, kuluköy ve kozanli köy
mexlîm ji hêrsa re reş bû
bû qetran
di hesê re ref û gaf dixwarin
hesê ne xema xwe bû
qelfetî hesê î ji qelfetî mexlîm quwettir bû
mexlîm radigerî
mat bû dawestî
mêxlîm bi qerf pirsakê din ji hesê pirskir
navî paytexta Tirkiye çi yê û li serbajeran kîjan kurum û kuruluş hene
paytexta Tirkiyê Kulu köy e
emê payîzî ji Kulu yê ji ser xanîyan re coraxê tînin
lokanta ramazanî tatare heyê
firina nanî bajêr heye
köykatîbî heyê
li wir karakol, jendarma
esker, başçavuş
û hebsxane heye
bêdengiyê ke wek axû
hewa ke giran

www.arsivakurdi.org

dengvegerên pêkên mêxlim
wek kurşinên serserî
dîwaran sinifê kotin dikirin
sinif bûyî bû goristan
û rêzên teleban wek yek gor
mexlîm dema kê li navbarê rêzan gerî bi şunda
ji nişke ve li ber textî resh dawestî
hilkişta ser kursî
ji jorda li teleban nerî
û cokê di dest xwe da bakir

yeni biçilmiş
sarı tarlaların içinde yürüyordum
ve seni düşünüyordum
seni düşünürken
sarı tarlaların içinde yürüyordum
sonbaharın sarı güneşi
beni ısıtırken
seni düşünüyordum
güneşin altında bulutlar kayarken
seni düşünüyordum
güneye uçan göçmen kuşlarını seyrederken
sarı tarlaların içinde seni düşünüyordum
güneş batarken
bulutlar kızıllaşırken
dağlar alevlenirken
sarı tarlaların içinde yürüyor ve seni düşünüyordum
göktaşları yol yol yanarken
seni düşünüyordum
yıldızlar nöbet beklerken
seni düşünüyordum
güneşin ilk ışıkları dağların doruğuna vurdugunda
sarı tarların toprağına uzanmış
seni düşünüyordum.

www.arsivakurdi.org

# Di derheqa belgefîlma

# MIN KÎ YIM

Esîn Akgül Güneş



## Fikra çêkirina fîlm

Ez ji Kurdên Konyayê, ji gundê Qerecdaxê û ji eşîra Xelika me. Wek çend hezar Kurdan keseka sirgûniyê me. Wek gelek kesan ku ez hatim emrekî, min jî pirs ji xwe dipirsîn. Ez kî me? Ku me ji gund barkire Enqerê pirsên min li min zêde bûn, Her ku pirs zêde dibûn barên min jî giran dibû. Her ku min kurdên ku ji bajarên Kurdistana Bakur barkirine Enqerê nasdikirin min xwe bi wan ve dizeliqand. Weke ku ez bêjim em çima ne bi hev re ne. Me ji kurdîya hevdû fêm nedikir. Min demeka dirêj hewl da ku ez ji her Kurdekî/ê fêm bikim. Ez hema hema ji xeynê Tirka bi kesekî re bi tirkî neaxivîm. Ji bo ku zimanê xwe pêşxim. Dûre ketim nava sîyaseta Kurdan. Di 1999 de cara yekem çûm Amedê





www.arsivakurdi.org



belê ez aîdê wan axan bûm lê bi salan çûm Kurdistanê hatim min hê jî negotiye ez ji vî bajarê Kurdistanê me, min xwe hinekê westand lê min piştre got ku ferq nake ez pê zanim ez Kurd im û Kurdistanî me. Min gelek caran xwest ez ji bo Kurdên Anatoliyê tiştekî bikim ku hinekê hestên xwe parvekim. Min ji hevalekî xweyî dokumenterist re got, were ez ji te re bibim rêber documentera me bikişîne. Lê mixabin guh ne da daxwaza min. Piştî demekê ez jî ketim nav kar û barên televîzyonan. Û min biryara kişandina dokumentera "MIN KÎYIM" wisa da.

**Çima Şêxbizeynî?**

Li Konya, Kirşehîr, Enqere, Çorûm hwd. Gelek eşîrên Kurda hene. Ji xeynî eşîra şêxbizeynîyan, eşîrên din bi kurmancî diaxivin. Çend hevalên min ê şêxbizeynî hebûn min ji wan re digot "zaravayê ku hûn pê diaxivin çî ye?" digotin "kurdî ye lê şêxbizinî ye," tiştê ku ez pê zanim di nava zaravayên kurdî de zaravayekî bi vî navî tuneye. Rêya min rojekê bi Başûrê Kurdistanê ket. Min dît ku zaravayê soranî û axaftina şêxbizeynîyan dişibe hevdû. Pişt re min got dibe ku ew jî soran bin. Kurdên Anatolyayê di nava bîy-

www.arsivakurdi.org

aniyan de xwe bi tenê hîs dikin. Şêxbizeyniyan him ji alî tirka ve û him jî ji aliyê kurmanca ve xwe bi tenê hîs dikirin. Wê rewşê ez diêşandim.

Û tiştekî din jî bala min dikişand. Heta zarokên wan jî bi nav dikirin ku ji ku hatine li Enqerê bi cih bûne. Ku devê kîjan şêxbizeynî vedikî, dibêjin em ji "Kerkukê hatine Elazîzê û ji wira jî hatine li Enqerê bi cih bûne." Ew meraqa wan pir bala min dikişand û ez pê gelek kêfxweş dibûm. Ji ber wan tiştên ku bala min kişandî ne min biryara kişandina Dokumenterê kir. Min li Haymana ya Enqerê dest pêkir û li Kerkuka Kurdistana Başûr bi dawî kir.

**Naveroka dokumenterê**

Asîmîlasyon, dîrok û ziman ji devê gel di salên. 2010-2011 de hate kişandin 2012 Sibat- Xilas bû

19-02-2012 – Li Enqerê Gala ya fîlm hate çêkirin. Di 16-05-2012 de li Amedê di mîhrîcana "*Fîlmamedê*" de tevî pêşbirkê bû.

08-06-2012- di festîvala fîlman ya "***Sînemardînê***" de hate nîşandan. 09-09-2012- Li Duhokê di festîvala fîlmên kurdî, di pêşbirkê de hate nîşandan.

**Balkêşiya ku hat nîşandan**

Temaşevanan piştî nîşandana fîlm gelek pirsên girîng dipirsîn. Min jî bi coş û xwestineke bilind pirsên wan bersivandin.



www.arsivakurdi.org

# Hestên Mehkûm

xeyalên min yên kavilbûyî
di hinavên xwe de
birîna hestên mehkûm
dihewîne
di rojiya mirina zîndanan de
bedenê xwe dixwim
temenê xwe vedixwim
û bêdengiya çarenûsa xwe
dadiqurtînim
bi êş û jana laşên dihelin
çûkên berbangê
lal dibin
stêrkên asîmanan
xwîn vedirişin
bax û bostanan
reş girêdan
çiya û daristanan
deng vedan
mêş û mozan
porê serê xwe rûçikandin
kulîlkên zozanan
ji hebûna xwe
şerm kirin
çem û kanî
di hêrsa coşa xwe de
xeniqîn
awaza stranên kezebşewat
hatin birîn
ez ê
ji kevirên zarokên kolanan
dîwarê serhildana egîd û mêrxasan
ava bikim
di nalîn û lorînên dayikan de
rîsê teşiya sebirê

www.arsivakurdi.org

birêsim
li hovitiya wijdanên bêdilovan
laneta serdeman
bibarînim
rûpelên çaxa genî
ji toza şerê qirêj
biweşînim
ji cîhana virek û derewîn re
lome
gazinc
û nifiran bikim
gemara rûyê zaliman
bi parzûna dilê xeşîm
bipalînim
li ber bayê çerxa feleka xayîn
destana mezlûman
binivisînim
bi neynokên giyanê îsyankar
zencîra bindestiyê
biqetînim
li ser qefesa welatê rojê
konê serkeftinê
vegirim
bafiroka aştiyê
bifirînim
ala serfîraziyê
li ba bikim
azadiyê
di henasa xwe de
biparêzim
û li meydanên dilê Amedê
bi tilîliyan govenda şadiyê
bigerînim.

Xizan Şîlan,
2012-11-11, Stockholm

www.arsivakurdi.org

Li ser parastina zimanê kurdî

# ÇEND XWAZKA

*Nuhê Hecî Malê Herşîd*

**Xwazka** ku girtiyên kurd yên di zîndanên Tirkiyê da sewa daxwazên xwe yên rewa, nimûne wekî perwerdeya bi kurdî û mafê xweparastinê bi zimanê kurdî û rakirina tecrîda li ser Ocalan neketibana greve xwebirçîhîştina bêsînor û rê û hecetên din bikar bianiyana. **Xwazka** wan şûna greva xwebirçîhîştina bêsinor ya ku ji can û jiyana wan ra bi tehluke ye, bikaranîna zimanê tirkî boykot bikirana û li şûna wî li her derê di danustandinên xwe yên bi idareya girtigehan jî va, destpê bikaranîna kurdî bikirana û bi vî awayî li hember zîhniyeta ku perwerdeya bi kurdî qebûl nake rabûyana. Li gorê nûçeyên medyayê nêzika 450 girtiyên kurd di zindanên Tirkiyê da ji 12ê Îlonê vir da di greva xwebirçîhîştinê ya bêsinor da ne.

**Xwazka** ku BDP, HAK-PAR, DDKD, KADEP, partî, sazî û dezgehên kurdan yên din ji nûva xwe damezrînin, tevehev yan jî her yek bi serî xwe biryarekê bide, qewlekî nû girêde û qet nebe ji niha pê da navekî kurdî li xwe bike, bername û destûrê xwe bi kurdi tenzim bike, kombûn û konferensê xwe bi kurdî birêva bibe, zanîn û hînbûna kurdî bike şerta endametiya partî, rêxistin û dezgehê xwe...

**Xwazka** ku rusipî, rewşenbîr, hunermend û rêberên kurda di platformên netewî, navxweyî û navnetewî da zêdetir bi kurdî bipeyîvin û di hevpeyvîn û nivîsên xwe yên di medya Tirkîyê da kurdî bikar bînîn û bi kurdî binivîsînin...

**Xwazka** ku hejmara kesên mîna edîtorê malpera Agenda Kurd, Çetin Taşçi zêde bibe. Taşçî çendekê berî vê xatirê xwe ji tirkînivîsandinê xwaztibû û destpê nivîsandina kurdî kiribû. Bê şik bi zêdebûna wan va hejmara xwendevanên kurdî jî zêdetir bibe. Em bibên, eger kêmtir 15 yan

20 kesî nivîsa Çetîn ya yekem a bi kurdî di malpera Agenda Kurd da xwendibe, ji hêla zimên da va qezenceke ne piçûk e...

**Xwazka** ku kurd xwaztekên xwe bi dubarekirinê erzan nekin û ji imkanên hînbûna kurdî bi rêya dersa bi zimanê dayikê li welatên Ewropaye baştir îstifade bikin. Li Elmanyayê hînbûna zimanê dayikê bi reya dersa makzimanî ne heqek e lê imkanek e. Bi salan sewa bidestxistina vê îmkanê rêxistinên kurda xebat kirin, têkoşîn. Her çiqas bi kêmanî be, ev imkana li çend eyaletan ji bo kurdan jî heye. Lê kurd bi layiqî xwedî lê dernakevin, mixabin kêm dêûbavên kurd ji imkana dersa kurdî ji bo zarokan istifade dikin. Astengiyekê vê mijarê ev e. Sebeba tunebûna imkane dersa kurdî li hen eyaletan Elmanyayê pirtir ji vê kêmeleqeya kurdan tê.

**Xwazka** ku şeytan bi kurda bikene yan kurd bi gura şeytên bikin û ji xwazteka xwe ya li ser perwerdeya kurdî venegerin, wê mîna xetekî sor qebûl û elan bikin. Serokê komisyona makqanûnê, Burhan Kuzu li ser pirseke şeytankî (sêrbazkî) ya pêşkêşvanê trt-turkê a ku bi gotina "eger BDP bi ya şêytên bike..." destpê dike, xwaztina perwerdeya kurdî mîna "xwestekeke şeytanî" bi nav kiriye û gotiye "perwerdeya bi zimanê kurdî dê welêt parçe bike."

Yanê bi heşê wî, eger kurd edeb, tarix, cografya û dersen fenî bi zimanê xwe hîn bibin, nimûne, ´du cara dudu dike çar´ ê bi kurdî hîn bibin Tirkiyê hema dibe du parçe. Serokê Hikumetê, Erdogan û serokê CHP, Kiliçdaroglu jî di eynê wextê da devê xwe ji xêrê ra venekirine. Erdogan gotiye „perwerdeya bi zimanê dayikê ne heqek e... zimanê resmî tirkî ye!" Kiliçdaroglu jî gotiye "em di wê baweriyê da ne ku perwerdeya bi zimanê dayikê dê civatê parçe bike." Ma Tirkîyê parçe nebûyê, çi ma ye? Her roj xwîn dirije û meyît tên helnanê, tirk û kurd neherin şînê hevûdu...

**Xwazka** ku şeytan giregirên siyaseta Tirkiyê ji rê derbixe û fikra perwerdeya kurdî di seriyên wan da bi cîh û war bike, belkû Tirkîyê hîngê ji parçebûnê xelas bibe.

**Xwazka**...
Mainz, 18.10.2012

www.arsivakurdi.org

# Ma ez jî dikanim kurdî binivisînim?

**Buco Demirsoy**

www.arsivakurdi.org

Destpêka edebiyata kurdî ya modern kîngê destpêkir nizanim, lê destpêka edebiyata kurdên Anatoliya Navîn bi Bîrnebûnê re destpekir. Bîrnebûn kovara yekemîn ya li ser KANê. Di kovarê de heta niha nivîsên li ser lêkolîn, hûner, kurteçîrok, hekat, hevpeyvîn, ji pirtûkên gerokên rojhelatanavîn, nivîs hatin çapkirin. Resm û belgeyên dîrokî hatin weşandin.

Nivîskarê Bîrnebûnê yê kedkar birêz Nuh Ateş bi ditîna min Cehovê Kurdên aliyê me ye. Birêz Ateş kurdiya KAN (Kurdên Anatoliya Navîn) bi stîleka taybet bi kar aniye. Dema meriv çîrokên Kekê Nuh dixwîne hîn peyvên kurdî yên hîro bi kar nayîn, tînê bîra xwendevanan. Di stîla wî de kurdiyeka zelal û xweşik xûya dike, keyfa meriv pê te.

Ez her hejmareka Bîrnebûnê bi çar çavan dipêm ku kurteçîrokên Kek Nuh û him jî nivîsên nivîskarê din wek Mem Xelikan, Seyfiyê Asê, Muzaffer Özgür, Ecevît Yildirim, Dr. Mikaîlî û çend nivîskarê din bixwînim.

Dîsa bala xwandevanan bikşînim ser ew xebat, xebatkar û kedkarên zimanê KAN. Qet înkar nekin, karê ku ew dikin zimanekî li ber mirinê dîsa rih û can didên û zimanê me zindî dikin. Ji destpêka Bîrnebûnê heta hîro, min tim dixwest ez jî nivîsên xwe jê re bişînim, alîkariya kovarê bikim, lê bi rastî min soza xwe bi cîh neanî, ez li hemberî xabatkar û berpirsiyarê kovarê rûreş bûm. Min pir fedî dikir, pir caran ev rûreşiya min hevalê delal Muzaffer li rûyê min texist.

Ez aciz dibûm, min tim rewşa xwe xirab dikir, le bi rastî jî ez meriki tembel im, ji nivîsandinê jî hez nakim, le zimanê min jî wek min pir dirêj e, rexnê û lêdana em pir xweş dikin.

Hevalan ji min re jî belki deh zêdêtir e-mail şandin, ku ez ji Bîrnebûnê re nivîsan binîvsînim. Her kurdekî li Tirkiyê serpêhatiyên hatin serî wan hene. Bi serî xwe trajediyek e, pêkêniyêk e, carna jî meriyan aciz dikin. Ew tiştên ji bo kurdbûna min hatine serî min jî

hene, min biryar da ku ez qet nebe carcaran ew tiştên hatin serî min binivsînim, belkî ez dilê hevalan şa bikim û kurdiya xwe pêşda bibim. Lê gerege ku hevalek nivîsa min serrast bike û kemasiyên min bi min bide eşkere kirin. Me kurdî li dibistanê nexwand û nenivîsî, em nivîsandina zimanê dayîka xwe nikanin binîvsînin. Lê li gor dengkirina gund û aliyê me piraniyên me baş kurmancî dizanin.

Wexta ez zarok bûm haya min ji kurda û pirsa Kurdistanê tunebû. Min digot  qey em însanê gunde me û çend gundên li doraliyê me kurd in. Bona ve jî komplekseka min a mezin hebû, min bi xwe û xwe digot; "Ma em çima ne tirk in? Ziman û edetên me çima ne mîna tirkan in? Dak û bavên me çima tirkî nizanin?“ Û pirsên hwd. diketin serê min. Lê ez ji nav van pirsan dernediketim, kesekî alîkariya min bikê jî tûne bû. Wê demê hîn televîzyon tune bû. Kominîkasyon û teknolojî ne mîna îro bû.

Min dibistana seretayî (ilkokul) li gund xelas kir. Li kazaya me Kuluyê, li dibistana navîn (ortaokul) qeyda xwe kir. Cara yekem bû ez di nav tirkan da bûm,  hin xwandevanên kurd jî hebûn. Tirk jî pir bûn. Tirkan bi me qirfên xwe dikirin, „*Kurdo*“ , yan jî „*Kurdoğlu*“ digotin. Bi wan gotinan, em li ber çavên xwe biçûk didîtin, ez bi xwe û xwe diqarîm, hêrs dibûm û min ji kurdbûna xwe fedî dikir, carna jî ji Xwadê re jî sîtem dikir, ma ez çima kurd kirime!..

Rokê di dersa dîrokê (tarih) da mijar Şerê Rizgarîyê (Kurtuluş Savaşi) bû. Dihat bahskirin ku, di wî şerî de cemiyêten li dijî şerê rizgariya tirkan dikirin hene. Ji wan du cemiyet jî yên kurda bûn û bi navên „ *Kurdistan Teali Cemiyeti*“ û „*Kurd Teavün Cemiyeti*“. Cara yekemîn bû ez navê kurda di nivîsekê da dibinim. Eşqa min pê hat, min pir merak kir, ka ew cemiyet çi ne, kesekî li dora min dizane ji tune bû. Lê disa jî van cemiyetana bala min kişandin. Di hundirê xwe da bi van cemiyatêna şa dibûm. Carna jî mezinên me qal dikirin, min guh dida ser wan. Digotin; „Hin kurd li Diyarbakirê, Urfayê, Mardînê hene, piranî van bajaran kurdan in“. Meraka min a li ser kurdan hîn pir dibû.

Heş û aklê min salên dewamkirî de hin têgehiştin. Xwandevanên me yên li bajarên mezin dixwandin, xeber didan me ku li Tirkiye hîn komel, rojname û siyaseta kurdan heye. Paşê kovar, pirtûk û rojnameyên kurdan bi destê min ketin. Li gundê me hêdî hêdî



www.arsivakurdi.org

kurdbûn, dîroka kurdan, siyaset jî di nav xortan de belav dibû, du hêz çebûn. Hêza Riya Azadî û ya din jî DDKD bû.

Riya Azadî, Roja Welat, Jîna Nû, Devrimci Demokratik Gençlik, diketin destê me. Min her hejmareka wan bi meraqeke mezin dixwend. Navê İsmail Beşikçi û siyasetvanên kurdan me wê wextê bihîstin. Li Başûr (Irak) qala Berzanî dibû.

Piştî min kurdbûna xwe qebûl kir, bi kurdbûna xwe serfîraz bûm. Li lîseya Kuluyê min ji hevalên tirk re hebûna kurdan diparast. Ji wan re behsa dîrok û zimanê kurdan dikir. Wî zemanî hebûna kurda hîn qebûl nebibû, kurd mîna tirkên çiyayî (dağ Türkleri) dihatin, qebûlkirin.

Kurdan êdî ji bo nasnameya xwe xebat dikirin, li bajarên mezin ê tirkan jî kurdan komel û civata xwe çêkirin, kîtap û rojnameyên bi kurdî derdiketin, weşana kurdî di nav kurdan da belav dibû, kurdan fraksiyon û komelên cuda çêdikirin. Ew jî Özgürlük Yolu, DDKD, Kawa, û Rizgarî bûn. PKK hat damezrandin, êdî şer di nav kurdan da jî çêdibû, kurdan kurd dikuştin. Her fraksiyon, partî û komaleyên din sûcdar dikirin. Bi navî, xayîn, feodal, işbirlikçi, sosyal faşist, cehş û hwd. Di nav vê kaosê da cunta12ê Îlonê hat ser hukum. Min bawer dikir kurdên rojekê bibin yek. Lê 30 sal ser ra derbas bûn, hîn jî kurd nebûna yek.

Bi wan kar û xebatên hatî kirin di nav KAN de welatparezî pir peşta çû. Lê pir însanên me derketin dervayî welat. Em hatin van rojan. Niha jî min bi kurdî nivîsand. Hîseka pir pîroz e. Jiyan bi kurdî xweş e, ma ez jî dikanim bi kurdî binîvsînim?!





www.arsivakurdi.org

**Rêzenivîs:**

# Şopên dema xatirxwastinekê - III

*Nuhê Hecî Malê Herşîd*

Sewa ku otobos wî negire yan jî girtina otobosê ji bîr bike, Simo geh kujê henîya xwe ya çepê bi cama otobosê hebstart û dikete nav xem û xeyalên rêwîtiya berve xerîbiyê. Bi xeyalên şîrîn mest û bi yên bixof mirûztahl dibû: Qezenceke bi xêr bereket…Xwandina li zanîngehê… Jîyaneke serbest û ji derd û tahliyan dûr…Zehmetiyên xerîbiyê û xemên rêlênebûnê. Geh jî ew bi Homer va dikete nav kat û hurgilîyên li ser meşeqet û serhatiyên çûyina Almanyayê û jîyana li wir.

Deng û gotinên wan teve yên rêwiyên din dibûn. Pîraniya rêwiyan mêr bûn. Çend jin jî hebûn, ew li rêzên paşî yên otobusê rûniştîbûn. Dengê jinan kêm dihata bihîstin, wekî ku tê gotin, wana dikire pistepist. Rêwîyên otobosê dibûn guhdarê tevliheviya dengan. Dengê guregur û leqeloka otobosê bi yê rêwîyan va li devhev diketin, dibûn qêrvîrçko. Carcaran dengê heywanên di hundirê otobûsê da heldihat. Dengine bi nalîn û hawar. Gava ku heywan ji keriyê xwe tên veqetandin û bi tenê dimên dengine weng ji gewriya wan derdikevin. Di navbera her du rêzên kursiyên otobusê da, li nav tûr û kodikên mêst, rûn û penêr da çend heywanê piçûk hatibûn bişûnkirin. Berxekî li ber kavirbûnê bi benekî bi destê xwedanê xwe va hatibû girêdan. Dîk û çuliqekî (elokekî) niggirêdayî û li ser kêlekê ramedandî bi çavên mat û tirslêbar li derdorê xwe dinihêrin û dinalîn.

Hewaya hundirê otobosê pirtir ji bîhna mazot û titunê dagirtibû. Mijara sohbeta rêwîyan li ser çûyîna Almanyayê bû. Çûyîna bi destê Dezgeha Kar û Karkir û ya bi rêya veşartî (qaçaxî) û di bin navê turîstiyê da.

Homer yek ji kesên qorê pêşî yên ku ji gundê Beranîyê çûbûn Almanyayê bû. Li gund ew, mîna zanayê Almanya dihatin hesibandin. Wexta ku ew sewa serdana malbata xwe dihatin gund, merên gund li dora wan dicivîn û jê çûyîna Almanyayê, jîyan, edet û rismên almana dipirsîn. Li gore ku tê qal-



www.arsivakurdi.org

kirin, carekê gava ku Homer hatiye serdana malbata xwe û li odeya wan ya mêvanan gundî li dorê gihêştine hev. Bavê wî, Broyê Bekê bi çend mêvanên din yên salmezin va li aliyê jorî odeyê li ser minderê rûniştîbûyê.

Mêvanekî ji Homer pirs kiriye:

- Homer, edetê gawiran çing in, ew jî mina me qedr û qimetê mêvanan dizanin?

Homer dûrdirêj qala edetên almana kiriye û li dawiyê şor aniye ser nihêrina wan ya li ser heywanan:

- Gawirê qedrê heywana pir dizanin. Kuçikê malê aha weng mîna bavê min li aliyê jorî odeyê bi rûniştandin didin!

Bi ser vê mînakdayina Homer da, ji mêvanan hena gotiye,"towbeestexfurlleh" û hen jî bi pistepistkî di ber xwe da keniyane. Bavê Homer jî serê xwe bakiriye û gotiye, "xwedêkî vî bi dengkirin nedin, ew jî mîna gawira bûye, şorê devî xwe nizane..!"

Homer pêçekê guh da ser sohbeta rêwiyên otobosê. Paşê berê xwe bi ber ve Simo kir:

- Xwedê dizana van heywanan, mast, rûn û penêra para memûrên Sazîya Kar û Karkira ye! Bertîlê (rûşweta) sewa xatirê çûyîna Almanya ye!

- "Qena te jî sewa çûyîna Almanyayê bertîl da memur û mudiran!" Simo lê vegerand.

- Çi derewa bikim, ji neçariyê min jî bertîl da wan. Xwandin û nivîsandina min tozikê zeif bû, lowma ez newêrim ku bixwe bikevim imtîhanê. Min du kîlo rûn û bi perê hîngê dused qayme (panknot) dane memûran û wan yekî din ji ber min va kirine imtihana xwandin û nivîsandinê. Miayeneya saxlemiyê ez bi xwe ketimê. Bi vê miayeneyê kesên saxlem ji yên pûç vedidan, mîna ku li bazarê pez dihata îzbend dikirin. Sewa vê miayeneyê, eyba reşe giranê, me xwe kurtazî kir. Devê şorê ye, me elemaşkare her tiştê xwe berda çolê. Em ji fedîya ra di herdê da çûn xwarê…

"Çing, yanê we kiras û derpiyê xwe jî êxistin?" Simo pirsî. Wî bersiva vê pirsê dizanîbû, lê dixwazt ku carekê jî ji devî Homer bibihîze.

- Erê erê, lê ez î diwême, kurtazî…Qe qalê meke, tu dere me nehîştin, ji devûdidanan da bigrê hetanî derdewan em di kontrola saxlemiyê ra derbas kirin. Mîna ku diwên, em di qula derzîyê ra derbas kirin. Lêbilem em dibizdinî ku

dereke me ya pûç (çûrig) derkeve. Heskoyê Milomer jî bi min ra çûbû miayeneya saxlemiyê. Delalê dayik û bavê xwe, bernexurê wan bû. Di xortaniya xwe da destê xwe bi îş û karekî nedikir. Xizanê min, zati hevalpişk jî pir tune bû, ji tirsa ku dereke xwe pûç derkeve dibizdiya. A ku ew ji ditirsî hate sêrî jî, li miayeneyê didanekî xwe kufikî derket, ji ber vê ew bi şûn da vegerandin. Paşê çû didanê xwe çêkir û weng derbas bû. Hîngê digotin, almanê di miayenê da li kefê destan mêz dikine û kesên ku destê wan bizmare girtî dibjêrine. Heskoya Milomer jî vayê bihîstiye. Çend hefteyan di ber mieyaneyê terv û bêr ji desta nediketine, dixwaztiye ku pê destê xwe bizmare bibin. Ku çi dihatiye ber, dar û ber, kevir û kurçik, pê destê xwe disutine…

Di pey van gotin û bîraniyan va Homer kesereke kûr rana û berê xwe bi ber Simo kir:

- Xwaz bi te, tu di miayeneya saxlemiyê ra derbas nebûyî!

- Na, ez î bi navî telebetiyê, sewa xwandinê diherime, lowma miayeneya saxlemiyê ne gereg e.

Homer û Simo pêçekî bêdeng man. Tê bigota wan sewa vêsîniyê bîstekê navber dayine sohbetê xwe, yan jî sewa ku xwe ji pirs û bersivên nû ra hazir bikin fersendek dane hevdu. Pir neçû, Simo dîsa destpê pirsan kir:

- Sahî edet û rismên almanan çing in, taybetên wan yên xas çi ne û ew tiştên ku li ser almana li gund ji devê kesên ku Almanya dîtine tên der çiqas rast in?

Homer xwe di cih da vir da û wê da livand, tê bigota ew î xwe rind bi şûn dike. Dû ra pişta xwe qeym bi kursiya ku li ser rûniştibû hebstart û got:

- Alman pir jîr în, jin û mêr siwê berbangê da destpê dikin û hetanî êvarî dişixulin, mina ku bibêjî, êsîrê îşa ne. Neyê comerd in, ku diherin restoran yan qehwexaneyekê her kes ji kêskî xwe dixwe û vedixe. Rokê li cihê kar, min li “pauze” cixarek teklife yekî alman kir. Wî cixare helna û got “dankşon”, pê ra jî hema 10 “fenîg” ji beriya xwe derxist ji ber cixarê va da min. Min helnena lê wî ez mecbur kirim…

Bi ser vangotinên Homer da, Simo bi gotina, “xwedêkê ha, ew çi edetê neçê ye, malneketno meriv cixarekê ji hev diêvîşine!” matmayîna xwe nîşan da.

- “Diwêjî çi can im, ew ê bi „fenîgan“ hesaw dikine, qurişekî



www.arsivakurdi.org

xwe bi ser kesî da bernadin û heqî kesî jî naxwin!” Homer da ser.

Gotinên bi zimanê almanî yên ku di dengkirina Homer da derbas dibûn bala Simo kişandin:

- Sê û çar sal in ku tu li Almanyayê yî, maşellah te çend şorên bi almanî teve kurmancîyê kirine. „kaof“ û „fenîg“ û „dankşon“ bi min nas in. Kîtebek li ba min heye, çend mahe ne ku ez jê bixwebixwe almanî dihêvîsime…Lê min „pauze“ qet nebihîst.

- „Walle te î rind hêvîsiyê, aferim ji te ra!“ Homer Simo pesand û da ser, got, “ji navberdayîna ji bo vesînê ra diwên “pauze!”.

Sewa ku rind di çavên xwe ra ke, Simo bi dîqet guh dida ser deng û ahengên gotinên almanî yên ku Homer bilêv dikirin. Bi liserhev pirskirinê, wî dixwazt ku Homer zêde bi dengkirin bide, jê malumatan derbixe û pê zanîna xwe ya li ser almana û Almanyayê kûr bike. Homer bi pirsên Simo xenê dibû, her ku Simo pirsek diavête ber, wî xwe mîna zanayê wê mijarê hês dikir.

Simo bîstekê di ber xwe da çend gotinên almanî yên ku di dengkirina Homer da derbas bûbûn, dubare kirin. Pêşkîteyên (hece) wan dirêjkirî dianîn ziman û guh dida ser dengê xwe: „feeenîg“, „kaaaof“, “dankeeeşon“… Dû ra, berê xwe berve Homer kir:

- Tu ji çi yê almanan yan ji kîjan rabûn û rûniştinên wan heznakî ?

- Ji rabûn û rûniştinên wan henê bi bed in. Pozpakijkirinê wan. Li fabrîqeyê, tu mêz dikî, ku merikî li hêlê te bi dengekî bilind „firrrr“ bi destmaleke xetinî da fiş dikê. Yan jî li hêlê te „virrr“ bê berdidê. Henê hene li ser kar, di „pauzê“ nîvro da bi pê nanî xwe dixwin. Wekî din jî, hezkirina ji kûçikan, avrijandina bi pê û paçkirina di devûlêvan da. Tu mêz dikî ku keç û xortên wan di tren û otobusan da elemaşkara hevdu di devûlêvan da paç dikine…

- “Li Almanya mahaş (mahiye) ê çing in, bi we dike?” Simo avite ber Homer.

- Mahaş bi me dike, ji ber jî dime. Li gund, tu jî pê dizanî, şivan û pala bo şeş maha dihatin ragirtin û heqê wana li gore wîjdana axelaran dihate birrînê. Li Elmanyayê mahaş li gorê lihevhatina sendika û patrona li ser bedelê seetekî tê birrîn. Dawîya her mahê mahaşê te li gorê seetên ku

www.arsivakurdi.org

tu di mahekê da şixuliyî didin te. Ji xêrî vê, perê „urlabê" yanê îzina salê jî heq e. Mahaşakê jî li ser navî „perê-waynaxê" bêî ku em ji bo van perana bişûxilin, didin me.

- Ma „waynax" çi ye? Simo pirsî:

- Cejneke (îdeke) dinî ya xirîstiyana ye. Li "waynaxê" ferdên malbatê li mala xwe digihên hev, bi xelatdayinê hevdu şa dikin. Li maweyniya mala xwe dara "waynaxê" dadinin û mîna dara nistî ya ku berê mezinên me paç pêva dikirin, bi cinciq û minciqan, bi qilotikên caminî û bi îşq û reng dixemlinîn…

Simo mijar anî ser karkirina li Almanyayê û ji Homer pirsî:

- Tu çi karî dikî, karî te î sivik e yan giran e ?

- Karekî pir giran e. Ez di fabriqeya hesin û pola da dişuxilim. Dan bi dan, geh danî sibê û geh danê êvarê û geh jî bi şev diherim kar. Hesin û pola kaş dikim û li erebeyên barkêşiyê bardikim. Ku kar xelas dibe, tu mêz dikî ku dest û pîyê li te qerimîne, tu bûyî xişav. Karkirineke bilez e. Ku dilî te bixwaze jî, tu bişîya nakî xwe ji ber badî û li kendalekî veseyî, „mayîster", hosteyê serkar bi ser te ra dawestiye…

- „Elman çi dixwin û vedixwin û ji çi pir hez dikin?" Bi vê pirsa Simo xwazt ku şorê bîne ser xwarin û vexwarinê.

- Alman goştê xinzir (beraz) û kumpîran (kartolan) pir dixwin. Kumpîr ji ser sifra almanan kêm nabe, şûna zadî me yê bulxur digre. Bîra pir vedixwin, xwe pê dikujin. Bîra li ba wan şûnê avê digre. Mêrê xwe ku çing kar berdidin û ji fabrîqeyê derdikevin berê dêv didin „qestevozê" (bîrexane). Li wir têrî xwe bîra vedixwin, paşê diherin malên xwe. Berê em di „hayma" da diman. Paşê me xaniyêk ji xwe ra kirê kir. Ez, Heskoyê Milomer û Meçoyê Mîmê tevehev dimênî. Brayê te, Hesen jî bi Mestê Alê û Remoyê Heyder va tevehev di malekê da dimêne. Xwedanî malê ku em bi kirê tê da rûdinin tozikê saf e, budele ye. Digotin wî, wexta ku li Rusyayê êsir maye, nexwaşîya kurbecînî derbas kiriye û bi ser vê da zû teqewut bûye. Salên xwe di ser şêstî ra bûn. Bîra ruhê xwe bû, jê pir hezdikir. Min yekcaran jê ra şûşek bîra dikirî. Wextê ku şûşê di dest min da didît, pê xenê diwû, bi lez berginde min dihat, mîna ku zêrekê xwe dîtiwe, îşqê çava dibiriqî. Wekî din termek bû,



www.arsivakurdi.org

di xwe da nedilivî, vi xwe ra nedikanî ji şûna xwe rabe û ji vir here herda han. Lê wextê ku şûşeyê bîrê di dest min da didît, dibû çîk, tavile radiwû ser xwe. Bi eşqekê şûşe vedikir û dadina ser xwe, mîna dergûşê ku pêsirê daykê dimije, „kurt“ û „kurt“ dadiqultand…

Pirseke din ya ku Simo pir eleqeder dikir jî li ser jinên alman û arûnemusa wan bû. Wî got:

- Li gorê ku tê qalkirin, mêrê me yên li Almanya dostê xwe yê jin hene. Bi heldana kesên ku çûyine Almanyê jinên alman ji axzê arûnemusê da sist in. Min ji devî çend kesan bihîst, diwêne arûnemus li ba wan tune! Ez tehmîn nakim ku gîştik weng bin. Ma jinên bêar û bênemus li ba ma tune ne!? …

„Helbet li ba me jî hene!“ Homer got û da ser:

- Jinên almana ê mîna mêran e. Ew jî di fabrîqeyan da dişuxilin. Li gorê jinên me ew ê serbest in, bi serî xwe li bajar û bazaran digerin. Fedî û heyayê pir nizanin. Yên ji axzê nemûsê da xeraw jî hene. Ku bi te ra deng dikin, çavên xwe dikin çavên te, tu î fedî dikî ku lê mêz bikî. Jinebîyên almana pir in, merên wan li herba dunyayê duduya hatine kûştin yan jî êsîr ketine. Salê henan di ser şêstî ra ye. De tu were wê, di nav mêrên me yên li Almanyayê ê nêt û fêl xeraw ne hendik in. Li gund bi jin, zar û zêç in, lê li Almanyayê di pêy jinan digerin. Yek ji wan Meçoyê Mîmê ye. Wexta li gund bû jî çavî li derva bû. Li Almanyayê nasekine. Kîngê ku betal bû nefesê li “Hortenê” heldine. “Horten” navê “kaofekê” ye, di qatê wê yê yeka da qehwexanek heye. Jinên bêkes û salmezin tên wê derê. Meço jî tim li wê derê ye. Meço bi jinebiyêke salmezin ra dost e. Remoyê Heyder digot, “heşê Meço ê di jêr dixunê ra ne. Ew î mîna nêrîyê ku bîhnê alorî vi ser ketî tim di dor jinebîyên pîr ra çerx dibê. Çi hîkmete nizanim, bi vê çehrê xwe yê neçê, pîrê alman gî jê hez dikine. Heznekin çir bikine, Meçoyî perê qehwe û pastayên wan didê, hîn çi dixwazine!…”

Bi van gotinên Remo, Simo û Homer pir keniyan. Dû ra Simo mijar guhêrî û pirs kir:

- Hun tiştî xwarin û vexwarinê ji ku derê distînin û wextê ku tişt distînin hûn li hesawdayînê xwe şaş nakin?

- Ji du rojan carekê em ê goştî mirîşkan dixwin. Li hêle jî zadê bulxur. Em ê bulxur ji gund da



www.arsivakurdi.org

bi xwe ra dibinî. Wekî din jî xwarinên konservekirî, peqlê (fasule) spî, goştê ga û masîyê hûrik dixwin… Li standina tiştê xwarin û vexwarinê hesawdayînê bi qah re. Li “kaofê“ tu mêz dikî li ser tiştekî bihayê wî nivisîne, „99 fenig“. Bimbarekno ha bikin 1merq, na…! Wexta ku em ê hîn nû bûn, ji avûrûyê hesawkirina bi „fenîgan“ me xwe li hesawdayînê şaş dikir. Nimûne, wextê ku digotin dênê we „19 merq û 49 fenîg in“, serê me tevlihev diwû, destûpîyê me li hev dipêçikîn û me xwe şaş dikir ku çir bikin. Malneketno, de bibêjin „19 merq û nîv“ yan jî „20 merq“, na ilam 19 „merq“ û 49 „fenîg“. Lê me çareyek dîtiwû. Ku hesawekî bi “fenîga” dihate ber me, me perê gir derdixistin û pê hesaw dida. Me “fenig” pir kêm xerc dikirin. Me ew digihandin hev û dibirin li dukanan yan jî li bankê çerxe pereyên gir dikirin. Paşê, em ro bi ro hû bûnî hesawkirin û hesawdayina bi “fenigan” jî…

Homer û Simo pêçekê bêdeng man. Serî kiribûn ber xwe, tê bigota ew ê vedisêne, yan di ber xwe da dueya dixwînine, yan jî guh didine ser dengên derdora xwe. Otobus berve Anqerêyê dixûşî. Ew geh hemêlî gir û baniyan dibû û geh jî di paş wan da wêr dibû. Dengê ku ji qulqewerên otobusê derdiketin û wêrewêra motirê wê, li gorê berve-jor helkiştin û bervejêr daketina wê dihate guhêrîn.

Mainz, 12.11.2012


**AGAHDARYEKE GIRÎNG**

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di ***Bîrnebûn***ê de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatoliya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliya Navîn didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin–mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmanciyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopiyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlenediya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

***Redaksiyon***

www.arsivakurdi.org



# Bîranîna Dr. Nebî Kesen

Roja 8/12-2012an de ji bo bi bîranîna rehmetî Dr. Nebî Kesen, çend heval, nasûdostên Nebî, endamên redaksiyona weşanxanê, ji endamên Waqifa Kurdên Anatoliyê, li Stockholmê, li lokala Apecê civiyan.

Ji redaksiyona Bîrnebûnê, Seyfi Doğan, Ji Waqifa Kurdên Anatoliyê Hemîd Atmaca, Mahmut Baran, Yusuf Güler, Harun Coşar, Îsmet Aktaş ji Federasyona Komelên Kurdistanê, Şermîn Bozarslan, Sidik Bozarslan, ji endamên redaksiyona Apecê Îhsan Espar û Hesenê Metê, ji gundiyên Dr. Nebî Kesen, Xizan Şîlan, Osman Köse û Memet Kesmez, hevalê Nebî yê dema lîsê, Yusuf Özden, kekê Mecid Çifçi û Hanefi Celepli di vê civînê de beşdar bûn.

Her yekî ji wan bîranînên xwe yên bi rehmetî Dr. Nebî Kesen re anîn ziman. Nebî çing naskirine, li ser xebat, berhem û kesayetîya wî, deng kirin. Hemû bi mirina Nebî ya weng ji nişkava, pir pê xemgîn bûn. Gîştikan Nebî, welatparêzekî demokrat, têgihiştî, durist, rastgo û dilşa dinasîn û mirina wî wendayîyeka pir mezin didîtin.

Pîştî bîranîna Nebî hemû li ser yek xalî hemfikir bûn ku ji vira ha divê em her însanekî xwe yî/yê xwedî têkoşîna ji bo mafê kurdan e, bi civînên wiha, bi bîrbînin. Armanc, têkoşîn û xebatên wan bidin naskirin ku ev neyên jibîrkirin!..

Ji van hevalana Xizan Şîlan û Osman Köse, ev gotinên xwe ji bo ku di kovarê de bên weşandin bi niviskî jî ji bo kovara me şandin.

*Ali Ciftci*



www.arsivakurdi.org





**Xizan Şîlan:** Min berê rehmetî Nebî Kesen nasnedikir. Sê an çar caran hatibû bajarê Stockholmê. Min ew bi saya kek Eli Çiftçi naskir. Lê berî ku em hevdu nasbikin, min ew gelek caran di Roj-tv de dîtibû. Dema ku ew di bernameyan de li ser rewşa kurda û dîroka Kurdîstanê diaxivî, ez pê kêfxweş û serbilind dibûm, ku mirovekî wisa zana û têgêhiştî ji nav kurdên Anatoliyê derketiye… dil, li min şad dibû.

Belê, min ji nêz ve Nebî nas kir. Nebî berî her tiştî xwediyê exlakekî durist, xweşbînî, paqij, dilpak, dilsoz, stûnerm û xwediyê bîr û baweriyê û demokrat bû. Rojekê min çavên xwe li malperan digerand. Min dît ku qala mirina wî dikin. Min şok derbaskir, bi wê nûçeyê bawer nekir. Wê kêlê êş û xemgîneyeke bi xof mêjî û laşê min rapêçabû. Min hema ji kek Eli Çiftçi re telefon kir. Wî jî bi dengekî nizm, berketî, kovan û bi zimanekî lihevgeriyayî got; erê, rast e. Belê, bi rastî Nebî ji nişkave, bêxatirxwestin, bêwext û zû ji nav me koç kir û çû dilovaniya xwe.

Bila serê malbata wî û gelê kurd sax be.

**Osman Köse:** Ez û rehmetî Nebî Kesen, li Încovê hevalê hevdu bûn. Têkiliya me bi hevdu re pir baş bû. Wê demê em xort bûn. Ji me re rojnameya *Riya Azadî* û kovara *Rizgarî* dihat. Nebî wê demê xortên Încovê li dor xwe kom dikirin û ji me re nivîsên rojnameyê dixwendin û li ser mijaran, ê têketa nav giftûgoyan. Nebî gelek zîrek, jêhatî û kurdekî welatparêz bû. Xwediyê şexsiyeteke durist bû. Mirina wî ez pir êşandim. Belê herkes ê rojekê bemire, lê hevalê me Nebî pir ecele kir. Ew ê her tim di dilê me de bijî.

Serê gelê kurd sax be!





www.arsivakurdi.org

# Kurmancîya malê, yan kurmancîya mamostayî/yê?

Remzî Kerîm

Sipas ji bo Yekîtîya Nivîskarên Kurd li Swêdê û Kitêbxaneya Kurdî li Stokholmê.

Bêguman nebûna rêxistineka mamostayên zimanê kurdî li Swêdê û platformên dîtir, hev nedîtin û li ser nepeyivîna pirsgirêkên perwerdeya zimanê kurdî ya li Swêdê, sedemeka serekî ye ku mamosta nikarin bên ba hev û mamosta û dayîk û bav nikarin bên ba hev u li ser pirsgirêkan bipeyivin. Lewra girîng e rêxistin û dezgehên din yên kurdî bi vî karî rabibin. Hem Yekîtîya Nivîskarên Kurd, hem jî Kitêbxaneya Kurdî ji ber vê yekê hêjayî sipasîyê ne.

Gava ji min hat pirsîn ku ez dixwazim li ser hin pirsgirêkên perwerdeya zimanê kurdî ya li Swêdê bipeyivim, min got erê, ji ber ku yek ji wan pirsgirêkan ji roja pêşî ya mamostatîya min heta îro jî hertim astengek bûye. Li gor ev pirsgirêk ne ya min bi tenê ye, belkî li Swêdê ya hemû mamostayên zimanê kurdî (mebesta min kurmancî ye û ji vir û pê da ez ê ji ber hêsankirina têgihiştinê gotina kurmancî bi kar bînim) ye, lê ez bixwe ji roja pêşî ya mamostatîya xwe pêrgî vê problemê hatime û heta îro jî berdewam e.

Berî ku ez behsa pirsgirêkê bikim, bi kurtî dixwazim li ser hinek alîyên rewşa perwerdeya zimanê zikmakî ya li Swêdê bipeyivim da ku pirsgirêk ji bo we jî zelaltir bibe.

### Grupên Heterojen

Li Swêdê gava di warê perwerdeyê de behsa grupên heterojen tê kirin, mebest jê stîlên cida yên fêrbûnê ne.

Stîla fêrbûnê çi ye? Stîla fêrbûne ew e bê kesek çawa xwe konsantre dike, ji bona ku zanîneka nû bi baştirîn û hêsantirîn awayî fêr bibe.

Gelek modelên stîlên fêrbûne hene. Kîjan rewş ji bo yekî baş e gava mirov tiştekî nû, yan tiştekî



www.arsivakurdi.org

zor, zehmet fêr dibe? Bêdengî, yan dengên nizim li ba yekî? -Hinek zarok gava dersê çêdikin li muzîkê guhdarî dikin, hinek xwe dixin oda xwe, derî digrin û ji dengekî pir nizim jî konsentreya wan xirab dibe. Hinek gava dersê çêdikin, qelema xwe dixin devê xwe, hinek qelemê li masê dixin, hinek xwe li ser zikê xwe dirêj dikin.- Li ser kursîyan li sinifekê, yan li malê li ser qenepeyeka nerm? Rûniştî, yan dirêjkirî? Xwendina bi dengê nizim û ji bo xwe, yan xwendina bi dengê bilind û ji piya? Xwendina danê sibê, yan bi şevê? Ji analîze gav bi gav ber bi tabloyeka kamil, yan ji kamilîyê ber bi detayan ve?

### *Grupên heterojen li dibistanê*

Lê li dibistanan ji van zêdetir behsa fêrbûna bi hestan tê kirin. Bi kîjan hisên xwe tu zûtir û hêsantir fêr dibî? Bi çavên xwe –visuell-? Bi guhên xwe –auditiv-? Çêkirina tiştekî bi destê xwe –taktîl-? Yan jî di pratîkê de bi kirinê –şînestetîk-?

Eger dorûber, sinif, yan jî metoda ku mamosta, yan pêşkêşkar bi kar tine, li gor stîla te ya fêrbûne be, hinge tu zûtir û baştir fêr dibî. Bo nimûne yên visuell bi xwendina çavan zûtir fêr dibin. Yên audîtîv bi guhdarîkirinê zûtir fêr dibin. Li gor lêkolînan %30ê swêdîyan tiştekî ji semîner û konferansan fêr nabin. Ji ber ku visual in. Bifikirin semînerek, yan konferansek ku bi tenê bi riya bîhîstinê zanînê digihîne mirovan, ji bo wan kesan çiqas ne xweş e.

Di sinifeke 20-25 şagirdî de dikare her çar awayên cida yên stîla fêrbûnê hebin. Ango ji alîyê stîla fêrbûnê de sinif sinifa grupeka heterojen be, ev yek karê mamostan girantir dike. Ji ber mamosta eger bixwaze şagird zûtir û hêsantir fêr bibin dive sinifê/cihê dersê li gor hemû stîlan amade bike, divê 1- Stîlên fêrbûnê yên her şagirdî/ê bizane, 2- Divê ji bo her şagirdekî/ê li gor stîla wî/wê dersê amade bike.

### *Grupên heterojên di ware perwerdeya zimanê kurdî de.*

Bi ya min ji bilî grupa heterojên ya li jor, di ware perwerdeya zimanê kurdî ya li Swêdê çend grupên din yên heterojen hene ku yek ji wan ew pirsgirêk e ya ku ez dixwazim li ser bipeyivim:

#### *1- Grupa şagirdên temencida.*

Şagirdên sinifên cida dikarin di nav yek grupa xwendinê de bin.

www.arsivakurdi.org



Ji ber rewşa perwerdeya zimanê zikmakî li Swêdê dikare rewşeka weha peyda bibe –gelek cara qaîde ye, ne îstîsna- ku şagirdên derin sinifa 2, 6 û 9ê bikevin nav heman grupê ku mamosta hefteyê 50, yan 60 deqîqa mecbûr e hemûyan bi hev re bike grupeka xwendinê û bi hev re dersê bide wan. Ev yek cidatir e ji dibistanê ku tesnîfkirî ye: Sinifa 1, sinifa 2, sinifa 3, 4, 5, 6, 7, 8, û 9.

***2- Grupa sewîyeyên cida yên zanîna kurdî.***

Ji ber rewşa giştî ya perwerdeya zimanê zikmakî li Swêdê, gelek cara mamosta, ne li dibistanekê bi tenê, lê li 6, 10, carna 15 dibistanan digere, ji ber ku li her yek ji wan dibistanan grupek şagirdên zimanê kurdî hene. Di nav her grupekê de jî dikare şagirdên kurd yên li Swêdê hatine dinyayê û du meha li ser hev di civateke kurmancîaxêv de nejîyayî hebin. Şagirdên ku di 10, 12 salîya xwe de hatine Swêdê hebin. Şagirdên li malê bi dayîk û bavê xwe re, bi mirovên xwe re hertim bi kurmancî dipeyivin, hebin, şagirdên ku dayîk, yan bavswêdî yan miletekî din hebin. Şagirdên ku dayîk û bavên wan li malê bi wan re bi zimanekî din dipeyivin hebin. Û bawer bikin ev jî ne îstîsnayek e. Ev yek weha dike di nav heman grupê de sewîy-



www.arsivakurdi.org

eyên, mustewayên cida yên zanîna zimanê kurdî hebin û ev jî karê mamostayên zimanê kurdî du cara girantir dike.

Û niha jî pirsgirêka ez dixwazim li ser bipeyivim. Di 13 salîya mamostatîya xwe de bi ya min yek ji pirsgirêka herî zor, yek ji pirsgirêkên ku wek mamosta li ber karê min bûye asteng.

*3- Grupa şagirdên "kurmancîyên cida".*

Hûn hemû ji min baştir dizanin û ne pêwîst e ez bêjim, welatê me parçekirî ye. Ji her çar parçeyan kurmancîaxêv li welatên cida bi cih bûne. Çar, li gor hina 5 zaravayên cida yên zimanê kurdî hene. Û hejmara wê nizanim, lê gelek varyantên cida yên kurmancîyê hene. Ez nabêjim devok, lê gotina varyantê bi kar tînim, ji ber ku bi ya min baştir li pirsgirêka ku ez ê li ser bipeyivim digunce. Varyanta kurdên anatolîyê, varyanta behdînanî, varyanta devera Mêrdînê, varyanta devera Ruhayê, Varyanta devera Serhedê, Varyanta devera Colemêrg, Wan û beşek ji Bidlîsê. Varyanta kurdên ji Kurdistana Sûrîyê, Varyanta Semsûrê û beşek ji Entabê, varyanta Mereşê û Meletîyê. Varyanta kurdên Makû û Ûrmîye û Mergeverê. Varyanta Efrîn, Koban û Çîyayê Kurmênc.

***Gelo ev varyantên kurmancîyê ji hev pir cida ne?***

Hem erê, hem na.

Ji bo zarokên ku di jîyana xwe de ti cara di civateka kurmancîaxêv de nejîyayî, li dibistanê bi vî zimanî nexwendî û li derve bi zarokên din re nelîstî û cara pêşî ji mamostayê/a xwe dibihîse famkirina varyanteka din pir zor e. Îca ew varyanta kurmancîyê jî hefteyê 60 deqîqeyan – di nav wan 60 deqîqeyan de her şagird çend cara derfeta peyvînê, nivîsandinê, xwendinê bi dest dixe ne mumkin e ji berê de bê zanîn.-

Ji bo me mezinan, ji bo kurmancîaxêvên ku kêm, zêde ji ber enteresa xwe, yan karê xwe bi kurmancîyê re didin û distînin, ne zor e. Ji ber hayê me ji rewşa giştî ya kurmancîyê heye, em dixwînin, dinivîsin, dipeyivin, lê ji hemûya girîngtir em dibihîsin –eger gelek cara em henekên xwe jî bi wan varyantan bikin.

www.arsivakurdi.org

Çend nimûne:

*Ez nikarim werim*
*Ez neşêm bihêm*
*Ez şi nakim werim*
*Ez nikarim bêm*
*Ez nikanim werim.*

*Ez vê kurdîyê tênagihim.*
*Ev ders ne ya xuş e.*
*Ez kurmancîya te anlamîş nakim. Pir zor e.*
*Ez vê kurmancîyê fam nakim. Zehmet e.*

Gelek cara gotinên pir besît yên rojane ji ber ku bi xwedî varyantên cida ne, dibin sedema tenegihiştinê û dilê şagirdan ji dersê sar dikin.

Ne îstîsna ye ku şagirdên 2, 3, yan 4 varyantan carna di heman grupa şagirdên kurmancîaxêv de hebin. Anku di grupekê 3, yan 4 varyantên cida yên kurmancîyê û di hefteyekê de 50, yan 60 deqîqeyên dersê.

Ji bona ku zelaltir be, ez ê ji çend nimûneyan ji pêkhateya hin grupên xwe yên şagirdan bibêjim:

Grup 1: 1 şagird ji devera Ruhayê, 1 şagird ji Mûşê, 2 şagird ji Omera (Kurdên Anatolîyê)

Grup 2: 3 şagirdên -12 salî- ji kurdên Anatolîyê, 2 şagirdên -9 û 10 salî- ji Nisêbînê.

Grup 3: 1 şagird -6 salî- kurdê Anatolîyê, 1 şagird -10 salî- ji Duhokê, 1 şagird -11 salî- ji Serhedê.

Grup 4: 8 şagirdên –14 salî- kurdên Anatolîyê, 1 şagird –14 salî- ji Nisêbînê.

Bêguman her yek ji van şagirdan kurmancîya ku li male tê peyivîn, dipeyive. Kurmancîya dayîk û bavê xwe dipeyive.

Û mamosta jî her yek ji devereka cida ya Kurdistanê tên û bi heman varyanta kurmancîyê napeyivin, yan di perwerdeyê de heman varyantê bi kar naynin û her mamostayek hemû varyantên kurmancîyê jî nizane.

Di hinek waran de standart nebûna kurmancîyê, standart nebûna rêbazên rastnivîsîna kurmancîyê, pirbûna varyantên heman gotinê, tesîra zimanên din, bi taybetî jî zimanê tirkî û erebî û bêguman di sere hemûyan de jî rewşa qedexebûna zimanê kurdî, li ba şagirdan û dayîk û bavan ji ber vê qedexebûnê û cezayên cida tirsa peyvîna bi kurdî, ji kurmancîya xwe piştrast nebûn, kurmancîya xwe ne wek kurmancî, lê wek varyanteka xirabûyî hesibandin.



www.arsivakurdi.org

Lê ez ê ji sedemên pirvaryantîbûna kurmancîyê zêdetir, li ser tesîrên vê pirvaryantîyê di karê xwe yê mamostatîyê de bikim.

***Erkê zimanî çi ye?***

Erkê ku gelek kes kêm, zêde li ser hemfikir in: Ziman berî her tiştî alavek e, amûrek e di destê mirovî de ji bo fikirîn, danûstandin û fêrbûnê. Mirov bi riya zimanekî dikarin hev fam bikin, bizanin ka yê dî çi dibêje, çi difikire, çi hîs dike.

Eger di danûstandina di navbera du mirovan de, di dana înformasyonê de nezelalîyek, yan kêmasîyek hebe, ew her du mirov hev tê nagihin, hev fam nakin. Ji bo hevfamkirinê divê ew aletê danûstandinê zelal be, bêkêmasî be. Eger kurmancîaxêvek ji Cîhanbeylî

-kurdekî Anatolîyê- û kurmancîaxêvek ji Duhokê nikaribin zelal, vekirî, bêyî şaş têgihiştin bi hevdu re suhbetê bikin, yan yek ji wan mamostê zimanê kurdî be û yê din jî şagirdekî mamosta yê 7-12 salî be, ew erkê zimanî yê aletbûna danûstandinê bi cih nayê. Di warê perwerdeyê de ev yek hê jî girîngtir e, ji ber ku ziman –çi zimanê devkî, çi zimanê nivîskî- mezintirîn amûrê danûstandina mamoste û şagird e. Ji bilî wê eger şagird zimanê pirtûk û materyalên dersê yên bi kurmancî fam neke, bêguman nikare zanîna xwe pêş de bibe.

***Tecrubeya mamostatîya min***

Gava min dest bi mamostatîya zimanê kurdî kir, kurmancîya ku min dizanî, kurmancîya ku ez dipeyivîm û kurmancîya piranîya şagirdên min ne yek bû. Me di destpêkê de nikarîbû suhbeteke kurt ya rojane jî bikin. Piranîya wan ji Anatolîya Navîn bûn û ev cara yekê bû min guhdarîya kurmancîya wan dikir. Berî hingê ez ti cara pêrgî kurdekî Anatolîyê nehatibûm. Gelek şagirdên min gazinde dikirin ku kurmancîya min û ya wan ne yek e: Ew dîyalekteka din dipeyivin. Û ev fikir ne bi tenê fikra şagirdan bû. Dayîk û bavên wan di wê qanaetê de bûn ku dîyalektên me cida ne. Hin ji bavên şagirdan digot:

”Kurmancîya me bozix e. Em pir kelîmên tirkî qulanmîş tikinî. Dîyalekta me başqe ye. Kurmancîya me başqe ye. A we başqe ye. Û kurikê (zarokên me) me qe kurmancîya we li ber xwe naxinî. Em şi nakin”.



www.arsivakurdi.org

Ez pir baş dizanim ku ev ”başqebûna” kurmancîya me ji bo şagirdên min problemeka mezin bû. Ji ber fam nedikirin ez çi dibêjim. Û min jî gelek gotinên wan fam nedikirin. Nîvê dersê bi kefteleft û heydedana famkirina gotinan derbas dibû. Famnekirina kurmancîya min dersa zimanê kurdî ji bo şagirdan carna dikir îşkenceyek. Ji ber zimanê tu fam nekî û tu mecbûr bî guhdarîyê bikî, weha dike ku zewqa te bişkê, tu fam bikî ku tu tiştekî fêr nabî û çûna dersê êdî ji te re bibe îşkenceyek.

**Du alîyên vê pirsê**

Du alîyên vê pirsê hene ku bi ya min divê em li ser bipeyivin.

1- Gelek kurmancîaxêv kurmancîya xwe biçûk dibînin, jê fedî dikin, dibêjin kurmancîya me xira bûye. Em pir gotinên bi tirkî bi kar tînin. Kurmancîya me ne mîna a we ye. Hûn tam kurmanc in. Ev bawerî tesîrê li zarokên wan jî dike û zimanê xwe –kurmancîya xwe- ”bêqîmet”, ”bi kêrî tiştekî nayê”, zimanekî prîmîtîv” dihesibînin. Hinek cara ev biçûk dîtin tesîrê li ser hin dayîk û bavan dike ku ji zarokên xwe re şûna kurdî, zimanekî din hilbijêrin.

Herweha ne ew bixwe bi tenê, kurdên din jî kurmancîya wan wek ”kurmancîya prîmîtîv” dibînin. (Ev gotin ya mamostayekî zimanê kurdî ye). Gelek kurd henekên xwe bi kurmancîya wan dikin û wan dikin pêkenînên suhbetên xwe: ”Hahahahaha. Qapî açmîş ke”, ”Qapatmîş ke”, ”Qulaxê min dêşe”.

”Ez di … kurmancîya weha …”, ”Were niiiiiikkkkk min. Hhhhhhhh”. ”Hele tu bi xudê li kurmancî mêze ke: ”Ew diçittt, dikittt, dibejittt. Ez Azadî dibînim”. Lawo bêj ez Azad dibînim. Ev çi Azadîîî ye îca. Ûhwd. (Ev cumle hemû ji suhbetên malan, ji Facebookê û ji odeyên çatê yên Înternetê hatine girtin). Ev henek pê kirin mixabin li nav kurmancîaxêvan pir berbelav e û weha dike ku kurmancîaxêvên varyantên cida ji kurmancîya xwe – ji xwe- fedî bikrin, bi kurmancî nepeyivin, û carna jî ji xwe re li nasnameyeka din bigerin.

Tesîra negatîv ya vê henek pê kirinê li ba zarokan/şagirdan pir mezintir e: Şagird berî dest bi dersa kurdî bike, weha bawer dike ku kurmancîya wî/wê ne kurmancîya resen e, kurmancîyeka naylon e û ji peyivîna bi kurmancî fedî dike, xwe jê dide paş. Ji ber suhbetên

www.arsivakurdi.org

henek pê kirinê gelek cara li ber zarokan/şagirdan, li malan tê kirin. Û bêguman zarok jî dibihîsin. Ev kurmancîya xwe biçûk, nerast, ”bozix” qebûl kirin, ji destpêkê de nîvê vîyan û karîna şagirdan dikuje û zewqa xwendina kurdî li ba wan namîne.

**2- Meyla bi taloke:**

***Wezîfeya mamostayên zimanê kurdî.***

Ne bi tenê şagird, lê mamosta jî her yek ji devereka cida ya Kurdistanê tê û bêguman varyanta kurmancî ya devera xwe dipeyive. Û gava şagird mamosta yan dibistan diguhere, pêrgî mamostatyek nû û varyantek din ya kurmancîyê dibe. Ev jî li ba şagird tevliheviyeka nû peyda dike û berdewamîya fêrbûnê dibire.

Divê şagird fêrî kurmancîya mamosta bibin? Yan?

Lê vê rewşa tevlihev ya ku min di gotina xwe de dest nîşan kir, meyleka bi taloke li ba mamostayan peyda kiriye: Ev meyl jî xwe bi du awayan dide der:

1- Her mamostayek kurmancîya xwe wek kurmancîya ”standart qebûl dike” û dixebite ku şagird fêrî kurmancîya wî/wê bibin. Nebûna standardîyê di hinek waran de û hebûna pir varyantan, nebûna dezgehên ”otorîter” yên perwerdeya bi kurmancî ku piranîya mamostayan wê otorîteyê nas dike, nebûna dezgehên ”otorîter” yên pirtûk û materyalên dersê her du lingên mamostayan dixe soleka teng. Mamosta bi tena serê xwe, bi 30, 50, 60 yan 70 şagirdên ji 7-8 grupên heterojen pêk hatî bi tena serê xwe dimîne. Ev yek weha dike ku mamoste kurmancîya xwe bike navend, bike bingeh, di perwerdeyê de bi kar bîne û kurmancîya xwe ”fêrî” şagirdên xwe bike.

***”Ez hîna jî dibêm qapî”***

Ev gotin gotina şagirdekî zimanê kurdî ye. Ev şagird 9 sala dice dersa zimanê kurdî û mamosta dixwaze kurdîya xwe “fêrî” wî şagirdî bike. Gotina ku “dive” şagird fêr bibe “derî” ye. Dike nake di suhbeta rojane de şagird her tim dibêje “qapî”. 4-5 salan piştî ku şagird 9 sala dibistana destpêkê bi dawî tîne, rojekê mamosta û şagird pêrgî hev tên û şagird dibêje: Mamosta ez hîna jî dibêm qapî.

”Jag forstod inte ett enda ord”.



www.arsivakurdi.org

”Min gotinek bi tenê jî fam nekir”. (Salekê piştî dersên kurdî)

2- Pirvaryantîya ku ez behsê dikim, hem di warê struktura kurmancîyê de -beşên gramerê- hem jî di warê peyvan de ye. Lê cidabûna peyvan û bikaranîna peyvên tirkî, yan erebî serî ji her cidabûneka din standiye û loma jî mamosta her hewlê dide ku şagird fêrî gotinên xwerû yên kurdî bibin. Ev hewldan carna ewqas mezin dibe ku mamosta fêrkirina peyvên xwerû yên kurdî wek girîngtirîn wezîfeya xwe dibîne. Ji bîr dike ku nikare bi kurmancîya dê û bavên şagirdan re reqabetê bike. Ji ber ku em li Swêdê ne di civateka kurmancîaxêv de dijîn, zimanê dibistanê ne kurmancî ye, lê swêdî ye. Şagird hefteyê 60 deqîqa tê ba me, lê piştî wê dersê êdî kurmancîya malê ya dê û bavên xwe, mirovên xwe dibihîse, dipeyive. Bi gotineka din nebûna pirtûkên dersê, nebûna tekstên kurmancî yên ku hemû şagirdên di grupekê de fam bikin, mamosta mecbûr dike ku bixwe hinek teksta bi kurmancîya xwe binivîse û hewlê bide ku şagird wê tekstê fam bikin. Ev ji bo şagirdan fêrbûna kurmancîyê wek ziman zehmettir dike. Ji ber ku famnekirina tekstê, yan famnekirina axaftina mamosta rê li ber her tiştê din digre.

Carna ev meyla xwerûkirina kurmancîyê ji alîyê mamostayan ve wek ”wezîfeyeka welatperwerîyê” jî tê dîtin û hestên welatperwerîyê serî ji wezîfeya mamostatîyê distîne.

Bêguman tevgera xwerû kirina soranîyê ya li başûrê welatê me jî tesîrê wek gelek kesên din li mamostayan jî dike.

”Ez dikarim hozanekê binivîsim ku yek gotina erebî yan tirkî tê de nebit”. (Li vir ne nivîsîna helbestekê, lê nivîsîna teksteka xwerû bi kurdî endîşeya bingeh e).

**Dê û bav**

Di nav kurmancîaxêvên Swêdê de baldarîya dê û bavan ya li ser karê mamostayên kurdî û kurmancîya ku zarokên wan fêr dibin cida cida ye. Beşek ji dê û bavan bi baldarî pirsa ji zarokên xwe dikin û dixwazin bizanin zarokên wan çi fêr bûye. Beşekî din hîç piştguh dikin, hîç napirsin. Di nav dê û bavên beşê pêşîyê de nerazîbûnek ji mamostayan xuya dike. Lê bi ya min ev nerazîbûn ne razîbûnek e ji ma-

mostatîya mamosta, belkî zêdetir ”nerazîbûnek e” ji kurmancîya mamosta. Bi piranî bav kurmancîya xwe ji ya mamostayî baştir dibînin û eger zarokek bê malê û bêje ez îro fêrî filan gotinê bûm û ew gotin di kurmancîya bavî de tunebe, yan sînonîmeke wê hebe, bav xwe nerazî dike û dibêje ”ev mamosta çi dike loo kurmancîya zarokê me jî xirab dike”.

Ji alîyê din ew meyla bi rîsk ya ku min li jor behsê kir, bi awayekî din xwe li ba dê û bavan jî dide der. Dê û bav ji mamostatîyê zêdetir, mamostayan li gor kurmancîya wan dipîvin. Eger yek li gor wan baş bi kurmancî bipeyive, ew mamostayekî baş e.

**“Çare”**

Jib o vê problema ku di warê perwerdeya zimanê kurdî ya li Swêdê derdikeve pêşîya min, ez dibêjim “çare” ew e ku mamoste di dersên kurdî de hem mamostayê/ya şagirdan be, hem jî şagird mamostayên mamosta bin. Bi gotineka din mamosta bibe şagird.

Ji bona ku mamosta bikaribe tevî hemû astengên li pêş mamostatîya zimanê zikmakî, tevî hemû astengên li pêş mamostatîya zimanê kurdî li Swêdê jî, tesîrên negative yên vê problema “famnekirinê” çareser bike. Bi kêmanî ji bo şagirdên xwe hewlê bide ku tesîra pirvaryantîyê kêmtir bibe. Lê jib o vê du tişt pêwîst in:

1- Divê mamosta hemû varyantên kurmancîyê wekî kurmancî qebûl bike. Divê mamosta hem di nav şagirdên xwe de, hem li ba dayîk û bavan, hem jî di nav civaka kurdî de li dijî henekpêkirina bi varyantên din yên kurmancîyê derkeve.

2- Divê mamosta û şagird di nav wan 60 deqîqeyên dersê de gelek cara karên xwe biguherin: Mamosta dive derfetê bide şagirdan ku bi kurmancîya xwe bipeyivin. Neku ji roja pêşî bi pêşhukmê ku “kurmancîya wan ne durust e, dive ew fêrî kurmancîya min bibin” berê xwe bide şagirdan. Divê mamosta ji şagirdan fêrî varyanta kurmancîya wan bibe û gava bi wan şagirdan re dipeyive, yan tekstekê amade dike, dive kurmancî, kurmancîya şagirdan be.

Ez dizanim ku ev yek karê mamosta zortir dike, barekî giran li barê jixwe giran, siwar dike. Lê hebûna tekstên bi varyanta kurmancîya şagirdan weha dike ku:

1- Şagird di nav tekstê de xwe



www.arsivakurdi.org

û kurmancîya xwe dibîne û pê ser-bilind dibe

2- Şagird tekstê fam dike. Dizane çi hatiye gotin û mamosta ji gumana “ka şagird vê tekstê fam dike yan na” xilas dibe û dikare piranîya dema xwe îca jib o dersa xwe bi kar bîne: Li ser tekstê xebitîn. Neku bi tenê li ser gotinên zehmet xebitîn.

***Yek nimûne:***

Wexta ez tiskî gir bûm, min her tişt anlamîş kir. Ez niha ji kurmancîya xwe fedî nakim. Ama tersî wê ez bi kurmancîya xwe ser-bilindim. Ez li malê bi kurmancî deng dikim. Li mektebê bi hevalên kurmanc va bi kurmancî deng tikim.

Wexta ez piçekê mezin bûm, min her tişt fam kir. Ez êdî ji kurmancîya xwe fedî nakim. Lê tersî wê ez bi kurmancîya xwe ser-bilindim. Ez li malê bi kurmancî diştexilim. Li mektebê bi hevalên kurmanc re bi kurmancî diştexilim.

Demê ez pîçek mazin bûm, ez her tiştî tê gihiştim. Ez nûke ji kurdîya xu şerm nakim. Bes berevajî ez bi kurdîya xu ser-bilindim. Ez li malê bi kurdî daxivim. Li medresê digel hevalêt xu bi kurdî daxivim.



www.arsivakurdi.org

# Parsekên Kurdistanî li Îskandînavyê
## (1899-1914)

"*Kesê ku du derewan bike dikare deh derewan jî bike...*"

**Rohat Alakom**

Di destpêka sedsala 20an de bi sedan ermenî, sûryanî û nestorî, kesên nemisilman ji Kurdistanê hatine welatên Bakûrê, bi rojan li Swêd, Norweç, Danmark û Fînlandiyayê mane, pere berhev kirine û gelek ji wan ketine dilqê parsekên kêmendam wek kesên topal, ker-lal. Van kesan bi nasnameyên sexte, bi "nasnameyên deynkirî" li van welatan mane, parsektî kirine. Lê belê paşê hemû ji aliyê polêsên van welatan de hatine girtin û piraniya wan hatine dersînorkirin. Van kesan gelek caran gilî- gazin li kurdan kirine wekî kurd li wan zordestiyan dikin. Çalakî, danasîn û propagandaya van parsekan navê kurdan gelek xirab derxistine. Piraniya van kesan kurd wek komeke zordest, êrişkar û xwîndar nîşan dane. Beşeke wan jî gotiye ku wek mînak ew dixwazin li Kurdistanê dêr, zarokxane yan jî dibistanan vekin, bona van çalakiyan pere berhev kirine. Tiştekî balkêş jî ne tenê li welatên Bakûr, li gelek welatên Ewrûpî wek mînak li Almanyayê jî kesên wiha peyda bûne, du nestoriyên Kurdistanê hê di sala 1844an de hatine Berlînê.[1]

Wisa xuya dibe ku hatina van kesan ne fenomeneke nû bûye û tenê bi welatên Bakûr re girêdayî nîn bûye, kesên wiha li hemû Ewrûpayê belav bûne. Paşê derketiye rûyê rojê ku ev karên binerd bi dîzî û veşartî, bi sîstematîk tên meşandin. Gelek tişt û bûyer li serê van kesên ku ji deverên gelek dûr hatine van welatên Îskandînavyayê, derbas bûne. Serpêhatiyên van kesan çawa em li jêr jî dibînin gelek caran bûne mijarên rojnameyên wan salan ku li welatên Îskandînavyayê derdiketin. Rojnameyeke Swêdiyên Fînlandiyayê dîyar dike ku angorî gotinên gotiyan li Rûsyayê, li bajarê Petersburgê "Acenteyeke kurd" (Kurdisk agentur) heye ku rêberiya vê koma parsekan dike. Angorî rojnameyê endamên wê li hemû cîhanê belav bûne. Di nivisê de bi hûralî li


[1] *Utrikes*, Borgå Tidning 14/12 1844.



www.arsivakurdi.org

ser vê tora parsekan tê sekinîn ku li Fînlandiyayê gelek aktiv bûye. Ev parsek gelek caran ketine dilqê gelên curbecur û rolên xwe baş lîstine. Kesê ku ev nivîs amade kiriye her wisa jî qala aktorên kurd û ermenî dike wekî wan karên xwe çawa bi jêhatî meşandine. Carekê ev kes kurd e, mala wî ji aliyê ermeniyên kûjer de hatiye kambax kirin, yê din dîsa ermenî ye, xwîşk û dîya wî ji aliye tirkên nexirîstiyan de hatine revandin û girtin. Niha pereyekî mezin wek fidye ji wan dixwazin bona ku ew bên berdan![1]

Angorî agahiyên rojnameyeke fînlandî, polêsê rûs, komeke ker û lalan keşf kiriye ku li Yunanîstanê perwerde dibin, dikevin dilqê ker û lalan yan jî organeke bedena xwe jê dikin ji bo ku karê parsekiyê bi navê "ermeniyan" li Îskandînavyayê bi profesyonelî, baştir bi rê ve bibin. Rojnameyê navê vê koma kesên îthalkirî "Akademî" daniye û dinivîse ku ermeniyên wiha ne tenê li Fînlandyayê, her wisa jî li Danmarkê û Swêdê jî peyda bûne.[2]


— Polisen i S:t Petersburg har enl. ryska blad nyligen upptäkt den „akademi", i hvilken från Grekland importerade gossar göras döfstumma och stympade o. s. v. för att med större framgång bedrifva tiggareyrket under namn af armeniar. I Danmark hafva också dylika armeniar afslöjats, likaså i Sverge.

"Akademiya parsekan" xwe dide dest (Wiborgs Nyheter 24/7 1903)

Angorî rojnameyeke swêdî kesekî bi navê Johannes Schmidt ku di sala 1907an de hatiye Swêdê, dest bi berhevkirina pereyan kiriye bona alikariya dêreke li Kurdistanê. Ev kesê ku li devera Jönåker li aliyê bajarê Nyköpingê hatiye dîtin ji der erebî, tu zimanekî mayîn nizanibûye, di destê wî de gaziyeke nivîskî bi almanîyeke xirab hebûye. Rojname dinivîse ku tiştekî balkêş jî li Kurdistanê erebî kêm tê peyivîn, zimanê bingehîn li wir kurdî

[1] *Österländska tiggare, Östra Nyland* 3/7 1909.

[2] *Polisen i S:t Petersburg...*, Wiborgs Nyheter 24/7 1903.

www.arsivakurdi.org

ye. Rojaname di derbarê nasnameya wî de ketine şikê û hemwelatiyên xwe hişyar kirine wekî berî ku alîkariya van kesên wiha bikin, divê pêşiyê wan baş binasin.[1]


**En äfventyrare,** som kallar sig Johannes Schmidt, gästar för närvarande Jönåkerssocknarna i Södermanland och tigger ihop pengar till en "kyrka i Kurdistan". D. v. s. själf kan han ej vidare tala i saken, han lär öfver hufvud taget ej vara mäktig något annat språk än arabiska, en något öfverraskande omständighet, då arabiska är föga vanligt i Kurdistan, men hufvudspråket är kurdiska. Men han har ett på gräslig tyska skrifvet upprop, däri den kristna kärleken anmodas om hjälp, och reder sig för öfrigt med gester. Hans uppträdande är, säger en meddelare till S. L. T. allt utom blygsamt, tvärtom högst pockande och oförskämdt, och allmänheten torde ha allt skäl att se sig för, innan den lemnar honom några bidrag, då föga utsikt finnes för att de komma kristenheten i Kurdistan till godo.

Nûçeyek di derbarê parsekên Kurdistanê de
Östgötaposten 15/2 1907.


Gelek zenaetkarên rûs ku di van salan de ni navê "sågfilare" (kesê ku birekan tûj dike) dihatin navandin, di sala 1899an de berê xwe dane Swêdê û vê koçberiyê heta sala 1914an her berdewam kiriye. Mirovên bakûri wek casûsan li wan mêze kirine. Ne tenê li Swêdê wek mînak di sala 1904an de çend ermenî her wisa li Norweçê geriyane û pere berhev kirine. Cara pêşîn

1 *En äfväntyrare,* Östgötaposten 15/2 1907.

şêniyê Norweçê şik biriye ku ew casûsên rûs in. Paşê rojnameyan nivîsîne ku ev kesan wek rohilatiyên din ermenî ne.[1]

Di sala 1904an de parlementerekî swêdî, P. Waldenström bi navê *Hişyarî* daxûyanîyekê ji rojnameyên norwecî re dişîne û bala hemwelatiyan dikşîne ser yekî ku ji Îranê hatiye Norweçê alîkariyê berhev dike bona vekirina zarokxaneyekê li Kurdistanê. Ew kes, xwe bi navê Dr. Daniel dide nasîn, hersal tê Swêdê jî. Parlementer di vê kurtenivîsa xwe de dîyar dike ku wî li Swêdê berî çend salan du kesine wiha sextekar dîtine û ew eşkere kirine.[2]

Ji ber ku di van salan de gelek ermenî dihatin Swêdê, swêdiyan ev kesan û ermenî hema wek hev qebûl kirine, koka van kesan a etnîkî jî bi giştî "ermenî"qebûl kirine. Piraniya wan piştî bûyerên 1894-1896an hatine Îskandînavyayê. Çawa tê zanîn di van salan de li hemberî ermeniyan li Împaratoriya Osmanî hin êrişên etnîkî pêk hatine. Van kesan ji bo ku xwe li ber dilên van biyaniyan şirîn nîşan bidin, ev bûyer bi zanetî neçê bi kar anîne. Gelek ji van ermeniyan bi taybetî di salên 1902-1903an Kurdistana Osmanî hatine Swêdê, beşeke wan ji aliyê Urmiyê bûne. Ji ber ku parsektî li Swêdê qedexe bûye, bi destê berpirsên resmî di sala 1904an de li hemberî "*parsekên faris û ermenî*" (bettlande perserna och armenierna) nivîsek hatiye belav kirin. Di salên din de hejmara wan her çûye zêdetir bûye. Paşê polêsê Swêdê hemû ev kesan dersînor kirine.


Två nestorianske kristne från trakten af Kars, Artem Lasareff och Josef Jakowleff, hvilkas barn under senaste krig i Persien råkat i Kurdisk fångenskap, hafva från sitt aflägsna hemland begifvit sig ut för att, genom milda gåfvor, insamla lösepenningen för deras barn. Under deras vandringar

*Nûçeyeke ku qala du parsekên din dike*

(Finlands Almänna Tidning 14/1 1858)

Gelek ji wan li ser Rûsyayê re hatine Fînlandyayê. Du kesên nestûrî bi navê Artem Lasareff û Josef Jakowleff hê di sala 1858an de ji bajarê Qersê

1 *Sågfilare som armenier,* Östgötaposten 9/9 1904.

2 P. Waldenström, *Varning, Norska Aftenposten* 14/7 1904.

www.arsivakurdi.org

hatine Fînlandyayê bona alikariya zarokên xwe bikin ku "*di şerê dawî de li Îranê ketine destê kurdan*".[1] Kesê ku li Fînlandyayê zêde li ser hatiye axaftin kesekî bi navê Moses Bar Jakob bûye. Vî kesê suryanî gotiye ku ew ji Kurdistana Îranê ye. Wî xwestiye bi berhevkirina pereyan alîkariya zarokxaneyeke ku 66 zarok lê dimînin, bike. Bi oldarên Fînlandyayê re ketiye têkiliyan, di rojnameyan de gaziyên alîkariyê hatine weşandin. Di van gazîyan de kurd wek kesên talankar û êrişkar hatine danasîn. Gelek kes û dezgehên fînlandî alîkariya wî kirine.[2] Vî kesî wek mînak di Komeleya Semîtîstan de konferansek jî di derbarê çanda gelê xwe de pêşkêş kiriye.[3] Lê belê paşê kesên ku ew ji nêz ve ew nas kirine, nepakiya van kirinên wî ji berpirsên fînlandî re gilî kirine. Yek ji wan keşeyê ermenî, Abr. Amirchanjans e ku bi nivîseke dirêj sextekariya vî kesî derdixe holê.[4] Moses Bar Jakob di derbara zarokxaneya xwe ya li Kurdistanê û di derbara azadiya jinan de hin derew kirine. Abr. Amirchanjans ji bo derewên wî wiha gotiye: "*Kesê ku du derewan bike dikare deh derewan jî bike...*". Piştî weşandina vê nivîsa Amirchanjans, fînlandî êdî baweriya xwe bi Moses Bar Jakob û sedan kesên wek wî zêde naynin, ew êdî wek sextekar û şarlatan hatine navandin. Di dawiyê de rojnameyê di derbarê berhevkirina van pereyan de wiha nivîsiye: "...*Moses Bar Jakob berhev kiriye, berhev kiriye, dema têra xwe berhev kiriye, lêxistiye çûye welatê xwe*:"[5]

Mimkûn e ku di nav wan de hin kesên dilrehm yan jî nûner, endamên rêxistin û saziyên dilrehmiyê hebûne, lê belê kesên parsek û sextekar navên van jî xirab derxistine. Di van salan de hin mirovên zane hatine Îskandînavyayê. Wek mînak mamosteyekî bi navê Mirza Baba Bar Ischaja ku ji Tebrîzê bûye di sala 1896an de li Mariehamnê konferansek daye, navê konferansê wiha bûye: "*Welat û gel, erf û edet li Ermenîstan, Kurdistan û Îranê*" (Land och folk, seder och bruk i Armenien, Kurdistan och Persien).[6] Vî kesî gelek ziman zanibûye, şeş mehan li Swêdê maye û qasî ku xwe bide

---

1 *Två nestorianske kristne*…,Finlands Almänna Tidning 14/1 1858.

2 *En vädjan*, Nya Pressen 4/10 1895.

3 *Semitiska föreningen*, Hufvudstadsbladet 3/10 1895.

4 *Meddelanden från allmänheten*, Nya Pressen 25/10 1895.

5 *Krönika*, Nya Pressen 27/10 1895.

6 *Herr Baba Bar Ischaja,* Aftonposten 29/6 1896.



www.arsivakurdi.org

famkirinê, swêdî fêr bûye.[1] Vê carê mîsyonerekî protestan Moses Meliko bi hevalekî xwe yê Kurdistanî di sala 1895an de hatine bajarê fînlandî, Hangö bona vekirina maleke zarokên bêxweyî pera berhev bikin. Angorî agahiyên rojnameyê, vê gera ji Kurdistanê heta Fînlandyayê sê mehan ajotiye.[2] Kesekî bi navê Baba Knanishu di sala 1901an de ji herêma Agiriyê hatiye Fînlandyayê, bajarê Ekenäsê. Wî li Swêdê beşa diransaziyê xwendiye, piştî xelaskirina xwendinê, vegeriyaye welatê xwe. Berî ku here li ser çanda suriyaniyan û dêra wan axaftinek kiriye. Di eynî rojnameyê de tê gotin ku bavê wî Moratchan jî berê hatiye Fînlandyayê û Swêdê, li van deran ji bo vekirina sê dibistanan pere berhev kiriye.[3]

Çawa xuya dibe ew kesên parsek, ew karkerên gerok ku "sågfilare" hatine navandin û ev kesên xwendî ku li ser çandên rohilatê konferans dane, di van salan de gelek caran di nav kategoriya "bettlare-tiggare" (parsek) de hatine berhev kirin û çavekî polês hertim li ser wan bû. Van kesan gelek caran firsend dipan, dema karên wan baş nedimeşiya, wê çaxê rol û dilqên xwe diguhirandin. Ev karkerên gerok ku "sågfilare" dihatin navandin, vê carê diketin dilqê ermeniyan.[4] Angorî lêkolînekê wek mînak di sala 1914an de polês qasî 314 ermeniyên wiha parsek ji Swêdê dersînor kirine.[5]

---

1 *En långväga resande,* Fredrikshamns Tidning 19/9 1906.

2 *Långväga resande,* Hufvudstadsbladet 13/8 1895.

3 *Långväga främmande*, Wiborgs Nyheter 19/10 1911.

4 *Sågfilare som armenier,* Östgötaposten 9/9 1904.

5 Sverker Oredsson, *Svensk rädsla: Offentlig fruktan i Sverige under 1900-talets första hälft* , 2001, rûp.62.

www.arsivakurdi.org

# Hevpeyvînek bi Zagros Çetinkaya re

***Zagros, di hinek helbestên te de meriv bi giranî jîyana zozanan û gundiya dibîne, tu dikarî xwe ji bo xwendevanên Bîrnebûnê bidî nas kirin, ka tu li kuderê hatî dunê, li ku mezin buyî û zaroktiya te çawa tê bîra te?***

– Ez li Qerejdaxê hatim dunê (Konya - Kulu ) û heya 6 saliya xwe ez li gund bûm. Piştre me mal bar kir Anqarê û min li Anqara dest bi mektebe kir. Bi rastî dema ku zarokatiya min te bîra min ez bi ziztî dibim. Li ew salan min azadî nas kir, ew salan bi teybetî ji bo na min; nenika îro ye. Dema ku ez li wan rojên berê difikrîm, ez îro fêm dikim ku; divê mirov, azadiya xwe ji zarokatî da nas bike.

***Bîranîna ji zaroktiya te de, pir li ser te tesîr kiriye, ci bû û ew bîranîna dure di jîyana te de bandorek çawa hîşt?***

– Min zarokatiya xwe li zozaneke biçûk derbas kir. Û ne hevalên me, ne jî em qela bûn û me hemiyan lîstikên xwe bi xwe çêdikir. Ji qutiyên rûn qamyon, bi çamûra; mal, siyar û pir diştên din çêdikir. Û pişt re me ew lîstekên xwe dixist nav stîri vedişart. Piştî çend seatan em ê biçûna lîstekên xwe bo ku derxînin, lê me didîtin ku pez lîstekên me şikandine. Ew dema, jî bona me; wek bi tirkî dibêjin; '*mağlubiyet*' bû. Lê qet tu caran jî me dest ji lîstekên xwe ber nedida. Em êdî bi hêrs, dibûnî û em ê biçûna me yê lîstekên xwe careka din çêbikira. Û em ji zarokatiya xwe hînî şoreşê û *mağlubîyet* bûn.


***Dema te dest bi dibistanê kir, te çiqas bi zimanê tirkî dizanî? Çi bîranînên te yên wê wextê hene? Te xwe wek zarokêkî kurd, çing hîs dikir?***

– Bi rastî, min qet bi tirkî nedizanî. Wextê me mal barê Anqare kir, ez 6 salê bûm û min dixwest dest bi mektebê bikim. Lê pirsgirêk hebû, min nedizanî şagirdên din kurdî nizan ne. Welhasil, me *besmele* kişand, min dest bi mektebe kir. Ez çûm sinifa xwe, li sira xwe rûniştim û herkes gudariya mamoste dike û qet tu kes jî deng nake. Piştî çend daqiqa mamoste hat, ket sinifê. Û dest bi pirsan kir. Ji hemû zarokan pirskir



www.arsivakurdi.org

û sira hat ser min, wek zaroke dîn ez ji rabûm ser xwe. Ji min re tiştan dibêje, lê dibêje çi gelo!? Ez di hundirê xwe da dibêjim; 'ew ji dayika min re şor dike, çi!?'. Mamoste bi min re deng dike, bes ez qet tu tiştek fêm nakim û min dest bi gîri kir! Çend daqîqa girîm, û bi kurdî dibêjim; "ez dixwazim herim malê, ez dixwezim herim gundê xwe!.." Ew roj, roja min a yekem û paşî bû. Pişt wê ra min dest ji mektebê berda û salekê neçûm mektebe.



***Pîştre te kijan dibistan/universite xwend?***

– Dema ez 14 salî bûm, ez çûm Norveçê û min li wê derê dest bi mektebê kir û ekonomî xwend. Pişt wê ra derbasê Swêdê bûm. Û niha li Swêdê Pedagojiya Şano(Teaterpedagog) yê dixwînim.

***Tiştek tu kişand derweyî welêt yan jî tu mecbûr kir, çi bû?***

– Bi rastî, ez nizanim ji bo çi ez hatim. Lê tiştî ku ez dizanim, heye. Ew jî mirov pirî caran li peyî dilê xwe diçe. Û wexta bi dilê xwe diçe, qet ji xwe pirsnake; çima ez terim. Lê bes diçe. Û ez ji ketim pi hezin xwe. Bi taybetî ew kesên ku li ser hunerê dixebitin, ji hunerê hez dikin, ew dikevin peyî xeyalên xwe. Hedef û idealek wan heye û ew li peyî hedef û idealên xwe diçin. Jî bo min ji xeribî usa çebû.

***Em hinekî li ser huner û meraqa te ya li ser muzikê bisekinin. Min tu di warê şanoyê de nas kiribu û herwiha tu ji aliyê muzîkê ve jî tê naskirin. Gelo, ew ji ku tê? Tenê meraq bû an ji derûdora te kes an grubên ku tesîr li te dikirin hebûn?***

– Hemû endamên malbata min

www.arsivakurdi.org

hunermend in. Ez bi muzîkê ve mezin bûm. Wexta ez pênc salî bûm min bi birayê xwe re def lêtexist. Û pişt wê ez jî ketim nav jiyan û cîhana muzîkê û bi taybetî muzîk ji bo min cihekî taybet e. Her çiqas pirî caran bi ser nîvisan/ şano werim nasîn jî; muzîk, destpêka jiyana min e. Erê, rast e, hemû endamên malbata min hunermend in û tesîra wan jî li ser min bû. Lê ji bo min muzîk ne tesîri ye, tu dikerî çend salan di tesîra malbata xwe da bimînî, lê ji wextek şûnda tu ji wê tesîrê xelas dibî û ew wexta tu dest bî nasnameya xwe dikî, ez kim e? Zagros ki ye?'. Ji wê wextek bişûn da muzik bû hevalê min, bû helbesta min, bû evîn ji min re. Û mamostên min; Yılmaz Güney û Ahmet Kaya ne. Ez pir tişt ji wan hîn bûm. Şoreş, azadî, îdeolojî, muzîk, wek bi tirkî dibêjin; '*estetika sanat û jiyanê*' ji wan hîn bûm. Min qerektera xwe, wextek bi wan nas kir û bi pêşxist. Ez bawer im ku her li ronahiya rojê ez ê layîqê wan bim.

***Qasî ku em pê dizanin yek kitêbeka te ya helbesta bi zimanê tirkî, bi navê "Karanlık Senaryo" derketiye. Tu dikarî hinekî li ser vê berhema xwe û ku hene berhemên din ku tu li ser kar dikî, me agahdar bikî?***


– Karanlık Senaryo, kitêba min yekem bû û niha kitêba min a nû '*Seyir Defterim*' heye, du meh berî niha derketiye. Û ji deri wê, filmekî min î kurt hebû û min ew xelas kir. Û ji derî wê, li Stockholmê cihê *Academia Cultura* kar dikim. Bi Xwedê karê min pir e, çiqas bixebitim ew qas kar derdikeve.

***Ez ê pirs nekim bo çi te bi tirkî nivisîye. Meriv hunera xwe bi kijan zimanî xwe baş hîs bike û bi wî zimanî dinivisîne. Lê qasî ku min tu bi rêya kurtefilm û konseran de, muzîka te guhadrî kiriye, ez dibînim ku zimanê te yê dayîkê, kurmanciya te, têrî xwe heye. Gelo tu difikirî ku berhemên xwe, hestên xwe bi zimanê xwe yê dayîke, bi kurmanciya şîrin binivisînî?***

– Ji bo çi nebe, lê bi rastî zimanê helbesta kurdî pir cuda ye, pir kûr e. Mamoste digot; '*însan hangi dilde ağlıyorsa; o'dur yalnızlığının ana dili!'*. Û ji bo min ji weng e. Ez bi kîjan zimanî digirîm, ew e zimanê min. Wextek dayika min digirî; ew bi kîjan zimanî şîna xwe dike ew e zimanê min e. Zimanê kurdî, heya îro bi dewkî hatîye, ne li ser nivîsan. Ez dixwezim bi zimanê dayika xwe binivîsim û hîsên xwe bi kurdî binivîsim, lê ew, ewqas qolay ne bû. Her mirov zimanê dayika xwe hayî

www.arsivakurdi.org

û ji derî wî her mirovek zimanekî xwe yê entellektuelî ji heye. Ji bo min; zimanê tirkî, zimanê min ê entellektuelî ye. Ez bi kijan zimanî dinivîsim, ew ne pir muhîm e. Ji bo min tiştek muhîm heye ku tu çi dinivsini! Ew kesên ku li TRT6 ê kar dikin jî bi kurdî diaxvin; lê fayda wan li ser kurdan çi ye? Ez mirovekî durist im û ez kurdekî baş im. Bi can û dilê xwe kurd im! Û ji pirî kesan bêtir jî bi kurdî diaxivim, ji sîbe heya êvarê demogajiya sosyalizm, li ser mafê mirovahatiyê dikin, ez ji wan zêdetir sosyalist û humanîst im.




***Kitêba herî dawî ku te xwend, filmê ku te dît û şanoya ku te temaşe kir, kijan bûn?***

– Kitêba dawî min xwend; 'Zagros Çetinkaya - *Karanlık Senaryo*' bû, filmê min temaşe kir; Deng bê Deng e (ew ji filmêk ji Zagros bû). Û bi rastî ez pir di bin tesîra wê de mam, henek, lê bi rastî nayê bîra min, min sibê çi xwariye, ew nê bîra min, dê, film, kitêb çawa bên bîra min!)

***Tîştekî ku me ji bîr kiriye, pirseke ku tu dixwazî bi rêya Bîrnebûnê, bigihînî xwendewanên me hebin, fermo?***

– Ez dixwazim spasê bikim ji Ali Çiftçi re û hevalên din ku li ser Bîrnebûnê kar dikin. Bi rastî pir keyfxweş bûm. Û ji hemû xwendewanên we re û kesên hîn hêvî xwe ji wendenakiri ye, ew kesan bi can û dilê xwe her dem li ser navê mirovatî û azadîyê şer dikin, silavên xwe ji wan re dişînim. Hûn her di nav azadî û xweşiyê de bijîn!

# Li teniştê jîyanê

di rabirtiya tozgirtî nav salnameyên dirî da resimên kevnbûyî
peyameke newêrek hatiye nivîsîn
„roja evînan, li welatê cemedê…“
bi destê kê
kîngê hatiye nivîsîn heseke kiryar nenas

bîra avaretiyê kir
beziyana bê gavhejmartin
wendabûna li deştên xewle bêserîûbinî
firandina hêvîyên bendnekirî

di xeyalên xwe yên bi bîhnxweliya pey baranê da
qêrîniyên kuriktiya min
lomeyên ji bîrbûyî

birînên min yên qalik girtî
tama xwînkirina şevê bê pêhêsîn
ma her qalikek ji birîna xwe diweşe
henne her qalikek li ser birîna xwe rind e
naye zanîn lê
li hîç payizan hesret nikane zeviyên xwe rake
ne tu ê li ba min ewqas rind bimeyî
ne jî rûyê hesretê min ê biêş

evîndarên revok yên evînên bi çavşev
li vî bajarî êdî neman
- evînên ku jê mîna yên kevn bîhna pozbilindî dihat jî-
jehrûzemberek kirî
nav evînên temenê min da



www.arsivakurdi.org

evîneke xwîngirî li ser lêvên min ên qeliştî
û min, bîra te kir!

li deftera min ya fenê helbestên çizûviz kirî
-navên ku binî hatiye çizîkirin-
evînên wendabûyî hatine nivîsîn
bîranîyên qilêrbûyî hene li her derê vî bajarî
yên ku te lê mêzkirî lê nedîtî
qêrînên bêdeng yên ku te bihîstî lê hesnekirî!

li ser canê te, tîrêjên ji ber evarê mayî
li armance ixaneta stêrkan înada kenên ezmên î ku ez tê da wenda bûme
di kemîneke tarî ya bajarekî nenas da tême lê xistin

ne tu xwedêya hêyvê Selene
ne jî ez xwedêyê rojê Apollon
berêvareke westiyayî da
-bîranîyên wenda yên li teniştê vê jîyanê dikin meze-
bi xemeke ji rêbernameya evînên bî da mayî
hîn jî hoste ne em di şevitandina bîraniyan da jina min…

gîşt ev e…

*Zagros Çetînkaya*

Wergera ji tirkî: Nuhê Hecî Malê Herşîd

www.arsivakurdi.org

# ALAMURA

careke din

seet li hesretê parve bûn
bîhna tenêtiya min tê ji her derê
bitenêhîştin mabû bû
henne gavbigav bergihinde dûrketiyê bezîm

tê bîra min

erê, ew şeva tê bîra min
serçavê min di nav destên te da bû
bîhna xemê ji te diha..t
dikeniyam
xelasbûnî ji êşên xwe yên di paşlê min da gihane hev
ditirsiyam
canê te bi canê min bibû, kwîrik em bişewitin
evînê em ê bişewtandina, bi ser da jî em dikeniyan!
Ji avrûyê bermayiyên baweriyên me yên nerast
nerindiyeka bihata serê me
xwaz… bi te, ma çi ê bihata serê me…

erê, tenê evîn be!
yên din xeyalên masûnî…

şeveke baharê hûnik bû
ditirsiyam bi destê te bigrim
lê ku evînên min dîsa xwîn bibin
lê ku tirsa cihîştinê xwe li min bipêçe
dikeniyayî



www.arsivakurdi.org

di nav bablîsokan da bûm
dilê min xwe disot ji cirma evîneke li ba xwedê gunekar ra
gereg ji tirsên xwe gîştkan pak bibûyama
bihesiyama bi tîna canê te di canê xwe da!

dengê kilaman belav dibû li şevên baharê yên hûnik
sewa tezekirina sermestiya me meyeke din ji ya evînê
nifirên ji ber lêvên me mayî şevê dinivîsînin
lihevpêçîkî, tevlihev
ewqas jî omdîyên hubûyî
xeyalên ku gihêştine masûnîyê

gava te serîyê xwe bi sîngê min hebstart
min ji stêrkan peşniyaz dikirin
de, stêrkeke din jî birije
sewa te niyazek
niyazek jî sewa min
asîmanekê sewa evînê ez ê niyaz bikim…

evîn be Alamura
tenê evîn be!...

*Zagros Çetînkaya*

Wergera ji tirkî: Nuhê Hecî Malê Herşîd

www.arsivakurdi.org

# Zerdeştî

Kurdan dînî xwe yê berî îslamê, dînê Zerdeşt bû. Dînê Zerdeşt Mazdaîzm e. Navî Xwadeyê xwe Ahura Mazda ye û Zerdeşt peygamberê wî dînî ye. Mazdaîzm li ser du prensîpan hatiye dagirtin.

Rindî

Xirabî

Rindî, Ahura Mazda û xirabî jî Ehrîman temsîl dike.

Ahura Mazada navî nîzamê xwe Aşa ye. Yanê tevgera heqîqetê ye.

Duzena Ehrîman nîzamê xwe Drigu ye ew jî derew û xizanî ye.

Zerdeşt dînê xwe bi zordarîye bi însnan qebûl kirin neda. Ew dînê xwe bi riya aştiyê di nav xelke da wek derwişekî bigere belav dike.

Mazdaîzm bextê (qeder) qebûl nake. Dibêjê insan bi îradeyeke azad hatîye dunê. Ji bo wê jî gerek însan rindî û xirabîyê ji hevdu derxe. Însan berpirsîyarê buyerên xwe ye. Însan wextê ku wegeriya dunê alîdinê li gor nêt û fêlen xwe ceza an jî mukafat bibîne.

Mazdaîzm ji aliyeki da jî, dînê habunê (existentialism) ye Însan navande habûnê ye. Gerek însan qederê xwe di dest xwe ke û hêza bîryarên xwe bi xwe qeraran bide.

Zerdeşt, ji Xwadayê Mazdaîzmê Ahura Mazda da wek Xwedayê hişa behs dike. Dibêje; Ahura Mazda Xwadayê aqil e. Ew bi aqilî xwe hereket dike.

Ji bo wê jî Zerdeşt dibêje; Xwedayê Xirabîyê Ehrîman ê şerî li hembere Ahura Mazda wenda bike. Çîmkî, ew bêaqil e. Rabirdû nayên bîra wî û li pêşarojê çi bibe nizane.

Ahura Mazda rabirdûyan tîne bîra xwe û dizanê li pêşarojan cê dê bibe.

Yanê xirabîyê bêbasîret e û rindî bibasîret e .

Mazdaîzm eqil dertixe pêş.

Dîtinên Mazdaîzmê, ji bo bext û vînê ji felsefê Nietzsche re dibin rêzan û rêber. Nietzsche wek Zerdeşt teslîmîyetê û stuyê xwe li ber qederê xwarkirinê qebûl neke. Nietzsche ji dinê Mazdaîzmê îlham digrê û kitêbêke bi navî *Also Sprach Zarathustra* - ***Ango Zerdeşt Dengkir***- dinivîsîne. Babeta wê kitabê, bi piranî îlhama ku Nietzsche ji Mazdaîzmê girtiyê. Yanê li ser qederê û îredayê



www.arsivakurdi.org

(daxwaz) azad e. Mazdaîzm dibê; Daxwaz(îrade) bingehîyê raman kirinê û hereket kirina însana ye.

Dîtinên Mazdaîzmê ji bo aqil ji gelek filosofên wek Descartes, Leibniz û Spinoza re bûye çavkanî. Ew filosofanan, li Ewropê filosofê dema agahtarîyê (dema ronahiyê) bûn. Wan filosofonan pîyonêrên felsefê rasyonalîzmê bûn.

Xweza gelek fîlozofên yewnanî jî ji Mazdaîzmê îlham girtine. Ji bo ku şorê qut bikim ez nuha nekevim nav wê minaqaşê.

Zerdeşt dibêje; sê prensîbên Ahura Mazda hene:

**Humata**: Tişt baş were fikirkirin;

Bingehîyê zanatîyê aqil e. Dezgeyên ku însan bi aqil bifikirî; biguman li tiştan û fikran bifikira û bi cavekî kritîk raman bike. Ji bo ku însan bi aqil bifikire gerek însanî azad be û bi serxwe be. Îradê xwe na yê di dest kesî da be.

**Hakhata**: şora baş were gotinê;

Meri dikane wê prensîpê bi du alîyan da şîrove bike.

a-ji alîyê etîk da

b-ji alîyê sosyolojîyê da

Li hemberî tevgere derewîn, tevgera heqanîyê heye. Gerek însan xîreta heqanîyê bikşîne ku dijî derewinan derkeve. Yanê însan derewan neke. Şorê rast bibêje.

Ji aliyê sosyolojîyê da gerek însan bi empatîyên ronakbîr û bi hîsên zîrek hevdû fehm bikin.

Sören Kierkegaard di şîîreke xwe de dinivisînê; ji bo ku ez alîkarîyê kesekî bikim divê ez bi xwe wî însanî fêhm bikim, lê sifteh û di ber hertiştî bizanim kî ew însana çiqas fêhm dike.

Te bîra min wexte ku min tiştekî nexweş digot, bavê min ji min re digot; berî ku tu dengî anjî şorekê bibêjî, wê şorê xwe sîûneh caran li ser zimanî xwe bigerîne û carê celî bibêje.

**Hivarşta**: Kar baş were kirinê.

Bingeha xirebiyê xizanî ye. Li gor dînê Mazdaîzmê, xizanî bêdînî ye. Ji ber ku dînê Mazdaîzmê karkirinê pîroz dibîne. Însanên ku kar dikin xurt û xweşik dibin.


Dînê Mazdaîzmê dînê karkirin û pakiyê ye. Dînê Zerdeşt dînê jîngeh û jîngeh parastinê ye.

*Seyfi Doğan*


www.arsivakurdi.org

# Ji Şoreş Reşî du kitêp

Di dîroka kurda ya gîştî de Sêvikan-Reşî cîyekî girîng dilîzin. Di vê pirtûkê de hûn dikarin ji serdema Hûrî, Med û Safewîyan heta roja îro dîrok, ol, kevneşopî, nufûs, belavbûn, cil û berg û guhertinên di nava Sêvikan de bixwînin. Beşên êlêyên ku parçêbûyî û li coxrafyayên dûr dijîn, fermanên qirkirin û bi zorê bicîh kirin û gelek niqtên din ên balkêş hûn dikarin di vê kitêbê de bibînin. Parçeyek ji dîroka vindabûyî ye.




Hinek kes dikarin bêjin, çi bi van ve heye? Belê, piştî bi dehan salan dikarin zarokên me meraq bikin ku ka kalên wan bi çi kenîne? 100 sal berê TV, radio, komputer, telefon û bi gîştî teknolojî tunebu an jî bi pêş neketibû. Xelkê wexta xwe çawa derbas dikir? Di jiyana rojane de pedêvîyên xwe yên ken bi çi didîtin? Ya herî girîng jî jîyan, tekilî, fantasî, rewşa civakî, toleransa wan li hember hev, aliyê wan yê afirîneri û olî çawa bû? Mirov dikare bi riheti tê de bibîne û dinyaya ku ew tê de dijiya nas bike…




www.arsivakurdi.org

# Weşanxaneya RÛPELê bi du berhemên girîng dest bi weşanê kir !

Weşanxaneya RÛPELê xebatên xwe yên avakirinê temam kir û bi armanca hêsankirina bikaranîn û nivîsîna zimanê kurdî, bi du pirtûkên bingehên sereke derket pêşberî xwendevanan.

Berhema yekem a bi navê Ji bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurdî (Kurmancî)-Tirkî [Doğru Yazım İçin Kürtçe (Kurmancca)-Türkçe Sözlük] hatîye çapkirin, bi koordînasyon û rêveberîya zimanzan Malmîsanij, bi beşdarîya zimanzanên ji alîyê raya giştî ve jî ji nêz ve tên naskirin yên wekî Mistefa Aydoğan, Zana Farqînî, Newzad Hîrorî, Huseyîn Kartal, Remzî Kerîm, Mahmûd Lewendî, M. Emîn Narozî û Reşo Zîlan di ecama bi xebateka hevbeş a nêzîkî du salan de hat amedekirin. Ev zimanzanan bi xebata vê ferhengê ku di beşa xwe de xebata yekem e, bi taybetî 9.000 peyvên pirguherto (pirvaryant) ku li gor herêman ji alîyê nivîskî û devkî ve guhertoyên wan ên cuda tespît kirine û di navbêra xwe de gengeşî kirine û biryar dane ji bo rastnivîsîna kurmancîyê kîjan guherto wekî standard bê pejirandin û di ferhengê de encamên ku bi hev re gihîştinê û pêşnîyazên xwe derxistine holê.

Berhema din ya bi navê Rêbera Rastnivîsîne [Doğru Yazım Klavuzu] ji alîyê Mistefa Aydoğan ku di xebata ferhengê de jî bi awayekî aktîf cih girtibû, hatîye amadekirin. Aydoğan vê berhemê bi armanca rêkûpêkkirina qayîdeyên rastnivîsîna kurmancîyê û jiholêrakirina tevliheviyên di warê nivîsandina kurmancîyê de, bi xebataka demdirêj û berfireh derxistîye holê. Di berhemê de navên hemû bajar û navçeyên Kurdistanê, navên hemû welatan li gel navên paytext û pereyên wan, navên roj û mehan, qayîdeyên herfên girdek û hûrdek, kurtkirinên ku zêde tên bikaranîn, qayîde û rastnivîsîna cihnavên kesî, rengdêr, lêker û navdêran bi vegotin, mînak û tabeleyan bi berfirehî û bi awayekî hêsanî bên fêmkirin, hatine şîrovekirin.

Ev berhemên ku her yek di warê xwe de xebatên yekem in, li ser daxwaz û piştgirîya projeya IKMGyê (Koma Medyaya Serbixwe ya Kurdî), bi koordînasyona zimanzan Malmîsanij pêk hat. Malmîsanij di pêşgotina ferhengê de pêvajoya pêkhatina van berheman wisa bi lêv dike: "Kesên ku bi kurmancî dixwînin û dinivîsin, ji pirbûna pirs-

www.arsivakurdi.org

girêkên kurmancîya nivîskî agahdar in. Nebûna zimanekî standard û kêmasî û tevliheviya qayîdeyên rastnivîsînê, dibin sebeb ku nivîskar di dema nivîsandinê de gelek zehmetîyan bikişînin.

Di dawîya sala 2010an de, min û Murat Satik û Riza Dînçî me hevûdin ditibû û em li ser pirsgirêkên rojnameya Le Monde diplomatique kurdî peyivîbûn. Wan di çarçoveya xebata IKMGyê (Independet Kurdisch Media Group) de ev rojname derdixist. Ji min re qala projeyên xwe yên weşanên kurdî, pirsgirêkên zimanê vê rojnameyê û wergeran kiribûn, di dû re fikir û pêşnîyazên min pirsîbûn.

Min jî gotibû, ev pirsgirêk hindî mezin in ku dewlet, yan jî dezgehên pir xurt dikarin ji binî rabin. Lê di gel vê zehmetîyê jî di mercên îro de ez du xebatên konkret pêşnîyaz dikim. Ez bawer dikim ku ev pêşnîyaz, dê di kurmancîya dahatîyê de xizmeta zimanê standard yê nivîskî bikin:

1) Amadekirina rêbera rastnivîsîna kurmancîyê.

2) Amadekirina pirtûkekê ku ji bo zimanê nivîskî bêjeyên (kelîmeyên) sereke nişan dide. Ango, bi hezaran bêjeyên ku di zimanê axaftinê yê kurmancîyê de hene û xwedî varyantên cihê ne, divê bên tesbîtkirin û ji varyantên her bêjeyê varyantek ji bo zimanê nivîskî bê hilbijartin.

Heke meriv bikaribe van du pirtûkan amade bike, ne bi tenê IKMG lê hemû kesên ku bi kurmancî dinivîsin dê jê sûdê werbigirin.

Wan jî got ku ew jî bi pirsgirêkên nivîs û bitaybetî wergerên rojn meya Le Monde diplomatique kurdîyê, hewcedarên van tiştan in û van her du pêşnîyazan minasib dibînin. Ferhenga li ber destê we, berhema xebateka çendpêngavî ye ku piştî wê hat domandin…" Dîsa bi nivîsa "ji wejanxaneyê" ku di destpêka pirtûkê de cih digire pêvajoya xebata van her du pirtûkan wisa tê îfadekirin: "Ev berhema di destê we de ji hewcedarîyên pêvajoya rojnameya Le Monde diplomatique kurdî ya ku 3 sal e ji alîyê Koma Medyaya Kurdî ya Serbixwe (İKMG) ve tê weşandin û ji lêgerînên çareserkirina pirsgirêkên zimanî ya nêzîkî 20 pirtûkên ji bo weşanxaneya Rûpelê tên amadekirin, derket holê… Bêşik ev xebat dê bi pêşnîyaz û rexneyên zimanzan û nivîskarên din û di dahatîyê de bi konferansên ziman û bêşdarîya sazîyên akademîk bi pêş keve û xwe nû bike.."

Ev her du berhemên ku bi metodên zanistî û akademik hatine amadekirin û hevûdu temam dikin ne tenê ji bo weşanên kurmancî yên



www.arsivakurdi.org

IKMG û RÛPELê, bi gelemperî di warê taybetmendîya standardîzekirina zimanê kurmancîyê de jî hewcedarîyan dibersivînin û du berhemên bingehîn in ku her kesên kurmancînivîser dikarin ji van pirtûkan sûdê werbigirin.

**Li ser RÛPEL û IKMGyê**

IKMG (Koma Medyaya Serbixwe ya Kurdî) ya ku ji bo van hemû xebatan derfet û îmkanan peşkeş dike sala 2010an hat damezrandin.

IKMG ji destpêka damezrandinê heta niha rojnameya Le Monde diplomatique kurdî bi kurdî (kurmancî) diweşîne û bi armanc û wêneka (vîzyoneka) mezin ji bo bi zimanê kurdî berhemên bi kalîte û girîng bên afirandin, xebatên xwe yên çapemenîyê didomîne.

Weşanxaneya RÛPELê jî bi awayekî fermî di çirîya pêşîn a 2012an de di çarçoveya projeya IKMGyê de dest bi xebatê kir. Armancên weşanxaneyê bi vegotina ku li ser navê weşanxaneyê di destpêka pirtûka yekem “JI Bo Rastnivîsînê Ferheng Kurdî-Tirkî” de cih digire wisa tê destnîşankirin: “Ji 1960î vir ve di derheqê pirsgirêka Kurdistanê û pirsgirêkên civakî, ziman, çand û dîroka gelê kurd de gelek berhem hatin weşandin.

Weşanxaneyên kurdî bi hewldanên ku wekî bi derzî bîrê bikolin,




li gel zehmetîyên dijwar û xeternak li ber xwe dan û ji alîyê weşangerîya kurdî ve daneheveka/dewlemendîyeka berbiçav afirandin û di bin sîyaseta zordestîyê ya asîmîlasyon, înkarkirin û qedexekirinê de li ser civak û dinyaya entelektuel a kurdî tesîreka mezin hiştin.

Weşangerîya kurdî li gel geşepêdanan hîn jî bi pirsgirêkên cidî re rûbirû ye. Berî her tiştî sînordarkirinên li ser ziman -ku ziman bingeha weşangerîyê ye- berdewam in. Di mercên wisa de ku perwerdeya bi zimanê zikmakî tunebe, hejmara kesên ku bikaribin bi zimanê kurdî bixwînin û binivîsin gelek kêm be û bazara weşangerîya bi zimanê kurdî tunebe, weşankarîya bi zimanê kurdî jî gelek dijwar dibe. Di heman demê

www.arsivakurdi.org

de tunebûna saziyên akademîk ên li ser zimanê kurdî xebatê bimeşînin û zanyarîyê biafirînin astengeka din a li pêşîya weşangerîya kurdî ye. Hîna jî di bîblîyografyayên di derheqê Kurdistanê de gelek kêm behsa berhemên kurdan û çavkanîyên bi zimanê kurdî tê kirin. Di van salên dawî de hejmara berhemên bi zimanê kurdî tên nivîsîn zêde dibin. Lê li gel vê yekê, ji ber kalîte û nestandardîya zimanî, pirsgirêkên weşangerîya kurdî berdewam in.

Ji hêla din ve, di van 20-25 salên dawîyê de, di civata kurdî de gelek geşepêdan û pêşveçûn hatin jîyin û gelek ezmûnên erênî û neyênî pêk hatin. Îro, hewcedarîya civata kurdî ji her demê zêdetir bi aqil û mejîyên hizirdar, bi pêvajoyeka rewşenbîrî ya nû ku bingeha xwe ji zanist û agahdarîyê werdigire û di warê çand û fikirê de bi veguherîna paradîgmayeka nû heye.

Di vê çarçoveya hewcedarîyan de weşanxaneya RÛPELê di derheqê pirsgirêkên Kurdistan û dinyayê de û di derheqê mijarên ziman, çand, dîrok û edebîyata kurdî de weşandina berhemên telîf û wergerê yên bi kalîte plan dike. RÛPEL, plan dike ku lêkolînên li gor vîzyon û armancên xwe teşwîq bike, projeyên hin berheman jî rasterast çêke û encamên wan biweşîne. RÛPEL, di




van xebatên xwe de, dê pîvan û standardên ku di warê çapemenîya navnetewî de bi gelemperî hatine pejirandin û profesyonelîyê wek bingeh werbigire.

RÛPEL, dê bi giranî bi zimanê kurdî weşanê bike. Wekî ku di destpêkê de jî hat gotin, yek ji pirsgirêka bingehîn a zimanê kurdî standardbûyîna zimanê nivîskî ye. Ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê ku bi pêşîlêgirtin û qedexekirina zimanî ve girêdayî ye, li gel zimannas, saziyên akademîk û nivîskaran peywirên girîng ên weşangeran jî hene."

**Navnîşanên xwestinê:**
Rûpel Basım Yayın Dağıtım
Sanayi ve Ticaret Ltd. Şti.
Tel: +90 (212) 252 02 24
Fax: +90 (212) 252 02 25
E-mail: **info@rupel.eu** www.**rupel.eu**
Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429

www.arsivakurdi.org

# AMED, erdnîgarî, dîrok, çand, derket




Nivîskarên pirtûkê Amed Tîgrîs û Yildiz Çakar in. Pirtûk ji aliyê Weşanxaneya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ve hatiye çapkirin û îhaleya çapê jî Weşanxaneya Lîsê girtiye. Pergala rûpelan (mizampajê) ji aliyê Weşanxana APECê ve hatiye amadekirin.

Pirtûka *AMED, erdnîgarî, dîrok û çand* du beş e: beşa yekem navenda bajêr û gundên wê û beşa duyem jî hemû bajarok (qeza) û gundên wê ne. Pirtûk 652 rûpel e û bi tevî rengîn e.


Mirov dikare bibêje ku ev berhem weke ansîklopediyeke bajarê Amedê (Diyarbekirê) ye. Bi kurtî dîrok, erdnîgarî, çand, aborî, civakî, demografî, etnografi, mîtolojî, perestgeh, ziyaretgeh û bi bigografiyan hatiye dagirtin.

Girîngiya vê pirtûkê yek jê ev e ku xwerû bi kurdî ye. Kurdiyeke sivik, nêzîkî zimanê axaftinê ye. Ya duyem, bi çav, mejî û perspektîveke kurdî û zanistî hatiye nivîsandin. Dîroknivîsên nijadperest û derewçîn ku heta niha xwestine dîrok û çanda bajarê Amedê reş bikin, tevlihev bikin, serûbino bikin, veşerîn û bikin mal û milkê xwe, di vê pirtûkê de, bi belge û argûmentên zanistî ev derew û planên wan yek bi yek hatine destnişan û diyarkirin. Dagîrkeriya ku heta niha bi perdeya "*çanda mozaîka gelan*" dixwest veşêrin, bi vê pirtûkê perdeya genî hatiye çirandin û derew û nîjadperstiya wan derketiye holê.

Ji aliyê din ve, cara yekem e ku berhemeke weha li ser Amedê bi hûrî, kûrî û berfirehî hatiye rawestin. Bajarok bi bajarok, tax bi tax, gund bi gund, gom (mezre) bi gom hemû bi taybetiyên xwe ve bi kurtî hatine nivîsîn. Parlamenter, şaredar, nivîskar, hunermen, navdar û dengbêjên amedî ji kîjan bajerok an jî gundî ne kurtejiyana wan hatiye nivîsîn û navên berhemên wan hatine destnîşankirin.

Herweha Navên gund û mezreyan bi kurdî û tirkî ne. Kîjan gund li ku ye, çend km ji bajêr an ji bajarokê dûr e, rewşa aborî û civakiya gundiyan çawa ye, çend kes li gund an li gomê dijin, ji kîjan netewî ne, ziman an zaravayên wan çi ye, cihên dîrokî, turîstîk, çem, çiya, deşt, zozan û zîyaretgeh li gund hene, çi ne, yek yek hatine destnîşankirin.

www.arsivakurdi.org




**13-14 /03/2013**

Folkes Hus - Hallunda

www.arsivakurdi.org